



NASNAV

DÎNDAR AVESTA

NAV U PAŞNAV

XALID REŞO QASIM

NAVÊ DAYÎK

DELAL

NAVÊ BAV

REŞO QASIM

CIHÊ ŞEHADETÊ

SERDEŞT

DÎROKA ŞEHADETÊ

17.09.2023

Desteya Weşanê:

- Osman ÇELİK
- Hinare TAJDÎN
- Ruken EHMED
- Aysel AVESTA AYDIN
- Xerip HISO
- Qasim KEŞKO
- Ayhan ERKMEN
- Evin ŞENGALÎ

Navnîşan:
Şengal -Sincar-

E. mail: Diclepres@gmail.com
Diclekovar@gmail.com
https://kovaradicle.com

TEL: 07871183609



DI VÊ HIJMARÊ DE

04

Ji Edîtor

06

**PEYAMA RÊBER
APO**

Ji bo konferansa
Şengalê

08

**Xweserî û Xweparastin bi qasî
şîrê dayikê ji bo Êzdiyan helal e**

Îbrahîm Osman

14

**Êzidî û Dewleta
Iraqê**

Mirad Şingali

18

**TAJÊ Îradeya jinên
Êzidî ye**

Tevgera Azadiya
Jinên Êzidî

22

**Hikumeta Sûdanî û
Peymana 9'ê Cotmehê**

Êzdîn Şingali



30

**Wateya cejna cimayiyê ji bo me
çî ye?**

Xelîl Baran

25'ê Mijdarê û têkoşîna Jinên Êzidî **34**
Evin Simoqî

40

Çîroka Strana Wawîska Bavê Qeşemê

Kolektîfa saza Êzî

46

**Komîn qada jiyane ye ku civaka ehlaqî
û polîtîk lê ava dibe**

Zilan Şingali

50

**Di Ronesansa Civaka Êzidî De Bi Jîneolojî
Ronesansa Civaka Êzidî:**

Akademiya Jîneolojî

56

ŞENGALA PÎROZ

Korda Mad Ezîzê Cewo

Xwênerên hêja yên Kovara Dîcleyê

Wekê tê zanîn demeke dirêj e têkîliyên di navbera dewleta Iraqê û Şengalê de bûne girêkên kor yên civakî û sîyasî ku divê bêne çareserkirin. Piştî fermana 03-08-2014'an gel bi îradeyeke xurt xwe birêxistin kir, birînên xwe pêça û heta astekî civaka xwe însa kir lê ruxmî ewqas sal derbas bûn jî dewleta Iraqê bi awayeke fermî Xweseriya Şengalê qebûl nekirîye. Bi taybet qebûl nekirina jenosîda Êzidiyan, ne tenê nedîtina gelê Êzîdî ye, di heman demê de tê wateya nasnekirina hafizeya dîroka gele me. Ev reftarê Dewleta Iraqê, êrişê li pêşeroja gel e ji ber wê jî bi şewazeke stratejîk nêzîk dibe.


Ev nêzîkatî hem di aliyê huquqî de valatiyê çêdike, hem jî lêgera gelê Êzîdî ya jiyana azad asteng dike. Ne naskirina Statûya Şengalê tê wateya xespirina mafê xwe rêvebirinê. Ev ne tenê meseleyekî îdarî ye, di heman demê de dahatûya hebûna azad a civaka Êzîdî ye û meseleyê hebûn û nebûna çanda kevna ya mirovahiya ye.

Lê belê ruxmî van jî li Şengalê pêşketinên ku hêviya gel mezin dikin jî hene, bi taybet piştî Konferansa Ronakbîrî ya Şengalê ya meha Tîrmehê, du komxebatên girîng jî encamdan. Yek ji wan, bi pêşengiya Tevgera Azadiya Jinên Êzîdî (TAJÊ) ya dîtîr jî dengê civakê ye herî bi hêz ya ciwanên Êzîdxanêbûn.

Di van komxebatan de, pirsgerêkên civakî yên weke xwekuştin, di temenê piçûk de zewac, koçberî hatin nîqaşkirin û lêgerîna rêyên çareseriyê pêşket. Her wiha jî bo çareseriya pêwîst jî gelek biryarên girîng hatin dayîn. Ev komxebat, bersiv e ji bo hêzên derve ku gelê Êzîdî li îradeya xwe xwedî derdikeve, piştî felaketên fermanê birînên xwe bi şewazekî wisa berbiçav derman dike. Rabûna xebatên bi vî rengî ya jin û ciwanan, deriyê pêşerojê azad li me vedike.

Îro pirsgerêka Şengalê ne tenê meseleyekî navxweyî ya Iraqê ye, di heman demê de girêdayî guhertina hêza serdestiya Rojhilata Navîn e. Lê heqîqet ew e ku heta îradeya civaka Êzîdî neyê naskirin û xwe birêvebene, ne pirsgerêkên Şengalê çareser dibin ne jî dewleta Iraqê demokratîk dibe.

Ji ber van rastiyan, hejmarê meya 37'an, bi taybet tîşk dixê ser têkîliya di navbera Iraq û Şengalê de. Her wiha balê dikşîne ser politikaya înkâr a jenosîde. Yek ji mijara me ya esasî ku em jê hêz digrin û dixwazin ev hêz hîn zêde berbiçav be jî hêza jina ku xwe birêxistin kiriye ku îro dibe hêza çareseriyê û komxebatan lidardixê. Ji ber ku em dizanin Heqîqet û Azadî tenê bi hêza rêxistinî mîsoger e.





PEYAMA RÊBER APO
JI BO KONFERANSA ŞENGALÊ

“Beriya her tiştî, ez we li ser navê hevrêyên xwe yên ku li vê derê ne silav dikim, di xebatên we de serkeftinê dixwazim.

Dîrok tenê behsa paşerojê nake; êşên ku hatine jiyîn, berxwedan û heqîqetê jî di nav xwe de dihewîne. Gelê Êzidî, yek ji ragirên herî qedîm û herî bi rûmet ê vê heqîqetê ne. Êzidî ku xwedî yek ji baweriyên destpêkê yên Mezopotamyayê ne, bi hezaran sal in li hemberî zext, koçberkirina bi darê zorê û tine hesibandinê hebûna xwe parastine.

Êzdayetî, ji baweriyek û kevneşopiyek zêdetir e. Jiyana aştiyane ya bi xwezayê re û pîroz dîtina ruhberan ji xwe re esas digire. Ji ber vê ye ku pergalên zordar her dem Êzidiyan ji xwe re xeter dîtine. Ji ber ku Êzidî, şopên jiyana azad û wekhev heya roja me anîne.

Dema bi zilmên mezin re rû bi rû man, Êzidî paş ve gav neavêtin; xwe spartin çiyayên Kurdistanê, xwe bi dîroka xwe û bi baweriyaya azadiyê ve pêçan. Hate xwestin ku bawerî û zimanê wan were qedexekirin lê wan çanda xwe dan jiyandin. Dema xwestin werin tinekirin jî, ji xweliya xwe ji nû ve ji dayik bûn.

Jinên Êzidî pêşengên esas ên vê têkoşînê ne. Ew bûn hedefa êrîşên herî giran lê ti carî serî netewandin. Bi berxwedana xwe ya li Şengalê, hem ji bo xwe hem ji bo hemû gelan, hêviya jiyaneke bi rûmet ji nû ve ava kirin.

Îro roj têkoşîna ku Êzidî dimeşînin, ji bo me hemûyan rê nîşan dide. Dengê wan, dengê kesên azadîxwaz e.

Ji ber vê, parastina gele Êzidî li ser esasê parastina cewherî de, xwedîlêderketina wijdana mirovahiyê ye.

Mafê herî xwezayî ya Êzidiyan e ku ji xwe re pergaleke ava bikin da ku karibin bi azadî, bi nasname û bi baweriyaya xwe bijîn. Ne dewletên zordar ne jî ferasetên teng ên qewmperestiyê vê mafê nas dikin. Ev encax li ser esasê wekhevî, xwişk û biratiya gelan, bi pergalekê ku karibin xwe birêvebibin mimkûn e.

Pêwîst e herkes vê zanibe; gelê Êzidî ne tenê ye. Ruxmê hemû êşên 73 fermanan, bi berxwedanê xwe gihandine roja me. Bi pêvajoya Aşitî û Civaka Demokratîk a ku em pêşdixin re, êdî wê ferman bi ser wan de neyê. Ferman êdî bi dawî bûne. Hebûna wan, ji bo her kesekî ku li vê coxrafyayê aşitî, xwişk û biratiyê dixwaze, mijara rûmetê ye.”

“ Jinên Êzidî
pêşengên esas ên
vê têkoşînê ne. Ew
bûn hedefa êrîşên
herî giran lê ti carî
serî netewandin ”



İbrahim Osman

Xweserî û Xweparastin bi qasî şîrê dayikê ji bo Êzdiyan helal e

Eger em Êzdiyan wekî cimata qurbanîyên fermanan, yan jî qewmê bermayên fermanan bi nav bikin, bi qeneata min ev ne şaş e û tesbîteke di cî de ye. Lewre ev 1400 sal in ku yek serdem û qurn bê ferman û komkujî di ser Êzdiyan re derbas nebûye. Li hemû rawestgeh, zivronêk û quncikên dîroka Êzdiyan binihêrin, tev kuştin, serjêkirin, talan, xenîmet û wêrankarî ye.

Bi taybet bi hatina Îslamê re, li herêmê kî bûbe desthilat, yan jî hewla desthilatîyê dabe, destpêkê hêza şûrê xwe li ser Êzdiyan ceribandîye. Tariperestên ji çola bejî û biyaniyê dihatin bi kîn, rik û çavsorî hewl didan Çiyayê Şengalê yekser hişkeziwa daqurtînin û Êzdiyan ji dîrokê hilînin. Lê bi rixma her tiştî, Êzdiyan ji bo jiyaneke bi rûmet herdem bi lehengî li berxwe dan.

Merem û armanca Ehrîmanên serdeman di gewriya xwediyên xwe de ma. Êzdî çiqasî kêr derfet û bêpişt bûn jî, wan serê xwe li ber şûrê melkemot jî netewandin. Wan di ber ola xwe ya Kurdistanî û xwemalî de bêyî çavtengî, ji canê xwe berdêl dan, lê ti deman terka ax û bawerîya xwe ya welatperwer nedan. Bi zor û zahmet be jî ola xwe ya Kurdistanî parastin, nebûn amûr û dûvikê ol û baweriyên biyanî. Ew ji kakil û koka xwe de resen bûn, bizrê şaristaniya Kevana Zêrîn di mista wan de zilda. Ew her wekî reseniya xwe pak man.

Ji Omer İbnî Xetabê Xelîfeyê Îslamê, heta bi Sultanên Împaratoriya Osmaniyan, Farisan, Paşayê Kor û Bedirxaniyan, bi sedê caran bi navê fermanan êrîş anîn ser Çiyayê Şengalê û Lalişa Nûranî.

Jîn û zarokên Êzdiyan dan ber devê şûr û rîman. Yên ji ber devê şûr û rîman filitîn, wek xenîmet birin li sûkan firotin. Belê, Êzdî û ferman, Êzdî û talan, Êzdî û malwêranî mîna du cewiyên hev in. Mîna ku çîroka Êzdiyan li ser kevirên nenas di binê deryayên bêbinî de hatibe nivisîn, mîna ku ên landika şaristaniyê hejandine ne ew in, her ku Êzdiyan xwest bê tirs hilmekê ji sîngê jiyane bikşînin pişka xwe, ew hinekî din ji ser dika jiyane kêr bûn. Êşa wan bû destaneke lal di dil û hinavên wan de. Nifşan êşên çîrokên fermanan ên xwîn jê diniqutîn dewrî nifşan kirin. Birînen fermanan ti carî qamûş negirt, di dîrokê de nebûn bîranîn, her wekî birîn dev vekirî û zindî man. Şewata ku bi bêdengî di hundirê wan de bû xwelî, ne xwe li xetên rûyên wan da der û ne jî ket nava gotinên çîrok û serpehatiyên wan ên eşker û şenber.

Binihêrin, li gorî daneyên li ber dest, bi tenê di Fermana 3'ê Tebaxa 2014'an de, (ku wekî fermana 73 yan tê pênasekirin) 11 hezar û 417 Êzdî hatin qetilkirin, vana di 93 gorên komî de hatin binaxkirin. 6 hezar û 427 Êzdî hatin revandin. Heta roja îro 3 hezar û 590 kes ji destê DAÎŞ'ê hatin rizgarkirin. Hîna aqûbeta 2 hezar û 827 kesan nayê zanîn. 325 hezar Êzdî ji Şengalê derketin. 100 hezar Êzdî koçberî welatên dinyayê bûn. Lê bi rixma vê, hîna jî dewleta Iraqê ya navendî û hêzên navdewletî bi aweyekî fermî fermana 73'yan nasnekirine. Ev jî tê wê wateyê ku ferman bi dawî nebûye, tenê şewazê fermanê hatiye guhartin.

Sedemên ku dihêlin Êzdî bibin hedef û armanca tevkuji û fermanan; yek jê: reseniya wan a pak û xwerû ye, ya din jî girêdana wan a bi axa wan re ye.

Di dirêjayiya dîrokê de çiqas zorî û zext li wan hatibin kirin, ferman li wan rabûbin, rûbarê Dîjle bi xwîna wan gelek caran sor herikîbe jî, wan terka bawerî, ziman, çand û axa xwe nekir. Hîn zêde bi nirxên xwe ve hatin girêdan. Êzdî resen in, ji ber ku qewil û duayên wan bi Kurdî ne, bi zimanê Kurdî bi Ezdayê xwe re dipeyivin, hêvî û lavayan bi Kurdî jê dikin. Bi Kurdî distirên û govenda xwe digerin. Ew bi bîrdozî û felsefya xwe xwezaperest in û bi mirinê bi axê ve girêdayî ne.

Wan timî qutbûna ji axê wekî mirinê dîtine. Lema berdêlên giran dane lê ji axê qut nebûne. Hêzên ku fermana Êzdiyan ya 73'an bi fermî nas nakin, wê wekî jenosîda sedsalê nabînin, ew ne tenê rastiye û dîrokê înkâr dikin, di heman demê de bingeha fermaneke din jî amade dikin û lempeya kes ji bo êrîşeke nû vedixin. Ji ber ku li gorî hesabû ku wan kiribû, fermana 73'an nîvçe ma. Ji ber ku armanca wan ji kok qelandina Êzdiyan bû. Li gorî hesabê wan gerek Êzdiyek jî li ser axa Şengalê nemabûya. Lê ji wan re li hev nehat û wekî wan dixwest bi encam nebû.



7 gerîlayên PKK'ê yên xwebexş, mîna heft diyarên Mala Adiya hawara Êzdiyan bihîstin û xwe gihandin wan. Heft kesan bi hezaran Êzdî ji qetlîamê rizgarkir. Lema hêzên xêrnexwazî û berjewendîperest, bi dek û dolaban, bi înkâr û zextan, nasnameya wan ya olî û çandî pênase nakin. Ew dixwazin fermanê bigihînin encamê û Êzdiyên ku bi berdêlên giran li ser axa xwe mane wan jî bikin qurbanîyên lîstokên xwe daku ew jî ji welat derkevin û derbeder bibin. Derbeder bibin da ku Şengala sembola Êzdîyatîyê ji wan re mîrat bimîne.

Piştî ew qas bela û bobelat, ferman û tevkujiyan, Êzdiyan ezmûneke jehrîn be jî ji dîroka xwe ya bi xwîn ders wergirtine. Êzdî di esra berbanga xwe de ne êdî. Piştî ewqas, bêbextî û îxanetê ji îro û pê ve baweriya Êzdiyan ji wan pê ve bi ti kes û hêzeke din ya di hêla bawerî û netewî de ji wan re biyanî nayê û wê neyê. Di vê mijarê de ne neheq in û mafdar in. Dîroka me ya nêz û ya dûr şadeye ku çî gava li Êzdiyan bûye pêsîrtengî, ferman li wan rabûye, çiqasî bergorî Ezda û evdên wî bûbin jî ti kes li hawara wan nehatiye. Qêrîn û hawara wan, mîna çilkek xwîn, hilmek bê bîn li lat û zinarê Çiyayê Şengalê asê maye û ti kes bi êşa wan nehisiyaye. Ên jê agahdar jî di rûreşîya bédengiyê de asê mane, bi erka xwe ranebûne û li hember dîrokê dengê xwe bilind û berz nekirine.

Mînak; beriya fermana 3.8.2014'an, deriyê malên Êzdiyan ji Erebên kirîvên wan, Kurdên misilman û Tirkmenên dostên wan re heta dawiyê vekirî bû. Çûn û hatin hebû. Ya girîng bawerî bi hev hebû.

“ Di dema fermanê de, parastina Şengalê bi fermî û alenî, di destê pêşmergeyên PDK'ê de bû ”

Ereb û Tirkmen kirîvên wan bûn, zarokên xwe di dawa hev de sunet kiribûn û Kurdên misilman jî ji neteweya wan birayên wan bûn. Bi şev û ro bi ser hev de diçûn û dihatin. Lê li vê rûreşî û sosreta kesnedîtî binihêrin ku destpêkê van kesan îxanet li Êzdiyan kirin û bi DAÎŞ'ê hov re êrîşî Êzdiyan kirin. Di dema fermanê de, parastina Şengalê bi fermî û alenî, di destê pêşmergeyên PDK'ê de bû.

Çawa leşgerên hikûmeta Iraqê ya navendî bêyî şer bikin, guleyekê biteqînin û li berxwe bidin Mûsil û gelek deverên din bi çek û zirîpoşan ve radestî Tarîperestên terorîstên DAÎŞ'ê kir, her wisa jî 14.000 hezar Pêşmergeyên qaşo parastina Şengalê û Êzdiyan dikirin jî, bêyî yek guleyekê biteqînin Êzdî mîna qurbanî di nava lepên DAÎŞ'a hov de hîştin. Femandar û berpîrsên pêşmergeyan jin û zarokên xwe beriya fermanê bi sê rojan birin Zaxo û Dihokê. Çiyayê Şengalê bi serbilindî û bédengiya xwe, gundê Koço bi xwîna li hewşa xwe, şadeyên vê îxanetê ne. Tewanbar vê îxanetê ji bîr bikin yan bixwazin bidin jibîrkirin jî, wê dîrok û Êzdiyên xwedan rûmet û keramet ji bîr nekin.



Bi rixma femandarê pêşmergeyan ji Êzdiyan re digotin; “bê xem bin, emê we biparêzin. Heta yek pêşmerge sax bimîne emê terka we nekin.” Pêşmergeyên PDK'ê çekên di destê ciwanên Êzdiyan de ji wan standin û li siwareyên xwe siwarbûn û ji herêma Şengalê reviyên. Şengal wê rojê bi tena serê xwe di nav çembera êgir de ma. Dîrok şade ye ku artêşa hikûmeta Iraqê û pêşmergeyên PDK'ê di dema fermanê de Êzdî neparastin û wan Êzdî mîna berxên qurbanî li ser sifreya zêr pêşkêşî birayên xwe yên DAÎŞ'ê kirin.

Ji ber vê rastiyê, divê bê zanîn ku pêwîst e Êzdiyên Şengalê bi pergala xwe, xweseriya xwe û hêza xwe ya parastinê xwe bi rêve bibe û biparêze. Ev mafê wan ê xwezayî û rewa ye. Ya ku hikûmeta Iraqê û herêma Kurdistan ya bi xêr ji bo Êzdiyan bike, divê piştigiriya pergala xweserîyê ji bo Êzdiyan bikin.

Ev wê barê wan jî sivik bike. Di hêla deringarî de jî Şengal mîna giraveke li çolistanê di sêkuça Bermûda de asê bûye. Ji hêla çola jêr de mîna deryakî vekirî, dayîm metirsiya êrişan heye. Lewre tarîperestên çolê zû bi zû bela xwe ji Şengalê û Êzdiyan venakin. Dîrok şahde ye çî dema ew keysa xwe lê bînin wê êrîş bikin.

“Hevpeyman Şengalê” ya di navbera hikûmeta Iraqê û PDK ê de ku hêzên navdewletî jî hetanî bi radeyekê piştigiriya wê dikin, li dijî mafê mirovan, baweriyan û kêmecimata ye. Ev hevpeyman rê ji berdewamiya fermaneke din re vedike. Ji ber hêzên ku hesab ji tewanbarên fermana 73'yan ya li 3.8.2014'an nepîrsîn û ew nexistin ber lêpîrsînê, ne ji mafê wan e ku di derbarê çarenûsa Êzdiyan de bêyî vîn û temsîla Êzdiyan biryara bidin. Ti rewatiya wan hêza nîne biryara Êzdî wê çawa bijîn bidin.

Biryara “çawa bijîn” tenê wê Êzdî bidin. Bi sedê sala ye çî hatibe serê Êzdiyan ji ber baweriya wan ya Kurdistanî û Kurdbûna wan e. Azadiya baweriyan, ramanan û kêmenetewan hêmanê bingehîn ê demokrasîyê ye.

“Dayîm metirsiya êrişan heye. Lewre tarîperestên çolê zû bi zû bela xwe ji Şengalê û Êzdiyan venakin ”

Çi pêngava Êzdiyan li derveyî şêwir û mişewiran bigre, hesabê vîna wan neke, serî li raya Êzdiyan nede ne rewa ye. Ên di roja teng de Êzdî neparastin, ne ji mafê wan e di rihetiye de li ser navê Êzdiyan biryaran jî bidin. Ev di hêla sinc, siyaset û bîrdozî de jî weha ye. Pir zelal e ku hukûmeta Iraqê û ya Herêma Kurdistanê, mafê xwe rêvebirin û xwe parastinê nadin Êzdiyan, statuya wan nas nakin, Êzdiyan wek yên xwedî baweriyeke cûda û divê xweser bin, napejirînin. Ev jî ciyê mixabiniyê ye.

Çi hêza piştgiriya vê hevpeymanê bike ew jî şîrîk û tewanbar e. Ti guncîne, petrol û zêr li erdîngariya Şengalê peyda nabin. Heta çê, li her deverê ava şîrin ya vexwarinê jî nîne. Ango eger Êzdî li ser axa xwe bi şêweyekî azad girêdayî hikûmetekê ji wan xwe biparêzin û bi rêve bibin, wê zirarê bidin kî? Eger ne ji ber ol û baweriya wan e, ev red û înkâr ji ber çi ye?

Ola Êzdî teşe û rehên rikna xwe ji xwezayê wergirtiye. Êzdîtî xwezahez û xwezaperest e. Rikna baweriya Ezdayî tevna xwe li ser bingeha bi xwezayê re di nava aştiyê de hûnaye. Bi gotineke din baweriya Ezdayî xwezayê û giştiya zindî û ruhilberan wekî berhemên Ezda yên herî pîroz dibîne û wilo dihebîne. Ji ber wê ye dema bawermendên Êzdiyan sibeh û êvaran berê xwe didin rojê dia dikin, dibêjin: “Ya Ezda tu deriyê şeran bigre yê aştiyê veke. Xêr û xweşiyê bide 72 miletan me jî teve.” Gelo baweriyeke ewqasî aştiwxaz çi metirsiya wê ji bo pergala modernîteya kapîtalîst û pergala dewletperest heye ku li dij derdikevin û xwe bi xwe bi rêvebirinê jê re pir dibînin?

Divê her kes baş bizanibe, heta ku siya şûrê fermanan ji ser Êzdiyan ranebe, Êzdî li gund û cîwarên xwe bi şêweyekî azad bê tirs mirinê nejin, wê li herêmê tu kes hizûr û aramiyê mebine. Ji ber ku ên herî zêde neheqî lê hatine kirin, ji hemî mafên xwe yên civak, olî û xwezayî bêpar, Êzdî ne. Ên tên înkarkirin Êzdî ne. Eger Êzdî azad nebin ti pirsgirêk çareser nabin.

“ Ji ber ku ên herî zêde neheqî lê hatine kirin, ji hemî mafên xwe yên civak, olî û xwezayî bêpar, Êzdî ne ”

Lewma dubare dibêjim, xweserî û xweparastin bi qasî şîrê dayikê ji bo Êzdiyan helal e. Çi hêza dijberiya vê bike xizmeta hişmendî û zihniyeta DAÎŞ ê dike. Wekî ku Reberê Gelê Kurd Ocalan jî di peyama xwe de destnîşan dike; “Azadî û xweseriya Şengalê ne tenê ji bo civaka Êzdî, ji siberojeke demokratîk ya Rojhilata Navîn re pêngavekî stratejîk e.” Lewre di nava kom, kêmetewe û civakên herêmê de zilma herî zêde li Êzdiyan tê kirin. Ev zilmeke dualî ye. Aliyekî wê olî ye aliyê din jî netewî ye.

Lewra delavê herî derbasder û xelesa herî lawaz ev der e. Çi hişmendî û hewildana ku bixwaze civaka Êzdî bê statû bi hikûmeta Iraqê yan ya herêma Kurdistan ve girêbide, ew li dijî mafê mirovan û hevpeymanan civakî ya demokratîk e. Her du hêzên desthilatdar, di fermana 73'an de şîrîkatiya terorîstan kirine û tiliya wan li bazara firotina Êzdiyan ketiye. Ango destê wan bi xwîn e. Lewma, Êzdî bê statû hiştin tê wateya ku tu qurbanê radestî kujerê wî dike.

“ Di dîrokê de cara ewil e ku jinên Êzdî weha bi rêk û pêk û rêxistin gihîştine asta xweparastinê ”

Eger Êzdî îro li Şengalê bûne xwedî hêza xweparastin û bi rêvebirinê, bê guman bi ked û berdêlan gihîştine vê qonaxa îro. Ti kesî ev yek li ser siniya zêrîn pêşkêşî wan nekiriye. Wan ev destkeftî bi xwîna keç û kurên xwe bidestxistine. Lema jî wê keda xwe ji bilî keç û kurên xwe pê ve, radestî ti kesî nekin.

Êzdiyan di fermana 73'an de, di ber ola xwe de, li gel talan û malwêranîyê gelek qurbanî dan. Lê bêguman barê fermanê yê herî giran li ser milê jinan bû.

Jin, di berxwedana Şengalê de di rêza pêş de cî girtin. Wan di nava yekîneyên têkoşinê de bi jinxasiya xwe cî girtin. Di dîrokê de cara ewil e ku jinên Êzdî weha bi rêk û pêk û rêxistin gihîştine asta xweparastinê. Ev yek ciyê şanazî û serbilindiyê ye ku jin bikarin bi hêza xwe xwe biparêzin. Lê divê neyê ji bîrkirin ku ji destpêka civaka çînî heta roja îro, nakokiya di navbera tarî û ronayiyê de bi şer û pevçûnan didome.

Îro jî hêzên tarîperest û hevalbendên xwe hewil didin hêzên xweparastina xweser tasfiye bikin û jinan ji xebat, têkoşin û rêveberiyê dûr bixin, mîna berê bikin koleyên xwe. Xwediyên vê helwestê bi pergalên xwe ve paşverû ne. Heta ji dest wan were ew rê nadin ku jin azad bibe. Lê rastiyeke heye ew jî ev e: “Jin ne azad be, civak jî ne azad e.” Ev tenê gotinek yan dûrîşmeyek nîne, ev rastî û heqîqeta dîrokî û gerdûnî ye û siberoja civakan bi xwe re ronî dike.

Wek encam: divê statûya Êzdiyan were naskirin, Êzdî xwe bi xwe bi rêve bibin û parastina xwe bi xwe bikin. Hikûmeta herêma Kurdistan û ya Iraqê divê rêzê ji vê re bigirin û destwerdanê di vîna civaka Êzdî de nekin. Xweseriya Şengalê wê girêdayî kî be divê bi navbênkariya hêzên hevpeyman û beşdariya nûnerên civaka Êzdî re were safîkirin.



Mirad Şingali

Êzîdî û Dewleta Iraqê - Beşa 1

Êzîdî yek ji kevintirîn komên olî û etnîkî yên Mezopotamyayê ne, ku rehên wan vedigerin demên kevnar. Tevî hewldanên asîmilasyona bi zorê û zordariya bi sedsalan, wan nasnameya xwe ya olî û çandî parastine. Hebûna wan a dîrokî li derdora Çiyayê Şingalê li bakurê rojavayê Iraqê, û her weha li deverên Şêxan, Başîqa û Behzaniyê li Nînewa sînardar bûye, ku wan dike beşek girîng a tevna civakî û çandî ya bakurê Iraqê. Tê zanîn ku Êzîdî beriya sedên sala xwedî erdnîgariyeke berfireh û mezin bûn li seranserê Kurdistanê.

Baweriya Êzidiyan li ser pergaleke olî û felsefî ya bêhempa ye ku hêmanên olên kevnar bi hev re dike yek, wan ji olên Îbrahîmî yên li herêmê belavbûyî cuda dike.

Ev yek wan di seranserê dîrokê de, ji serdema Osmanî bigire heya dewleta Iraqê ya nûjen, kiriye hedefa tawanbarkirin û cudakariyê. Di serdema Osmanî de, Êzîdî bi sînokirin, bacên taybetî û bidewamî oprasyonên tundûtûjiyê yên herêmî re rû bi rû man, ku vê bixwe re tecrûbeke dîrokî ya hişyarî û di heman demê de tecrîdê li hember desthilatên navendî di kesayet û civaka Êzîdî de afirand.

Bi damezrandina dewleta Iraqê ya nûjen re di sala 1921'an de, li ser bingeha dewletek neteweyî ya navendî, Êzîdî ketin qonaxeke nû ya têkiliya xwe ya bi desthilatê re. Ev qonax ji tecrûbeyên berê cuda bû, lê taybetmendiyên wê yên naskirî hebûn: hewldana dewletê ya ferzkirina hegemonyaya siyasî, aborî û çandî li ser

“ Li ser bingeha dewletek neteweyî ya navendî, Êzîdî ketin qonaxeke nû ya têkiliya xwe ya bi desthilatê re ”

civatek cihêreng û cuda, bêyî ku taybetmendiyên wê yên olî û etnîkî bi tevahî nas bike. Desthilatdaran pirî caran Êzîdî wekî astengiyek li pêşiya avakirina nasnameyek neteweyî ya fermî ya Erebi-Îslamî, an jî wekî «mijarên ku bi zorê werin entegrekirin» didîtin, ne wekî welatîyên xwedî mafên wekhev, di nava yek welatî de ku her kes an civak bi rengê xwe û li gor çanda xwe xwedî heman maf be.

Ev siyaseta ji destpêkê ve di hewldanên desteserkirina erdên wan, ferzkirina qanûnên leşkeriya bi zorê, an jî bicihkirina wan de xwe nîşan da, û di dawiyê de di dema desthilatdariya Partiya Baasê de di salên 1970 û 1980'an de bû sedema operasyonên sîstematîk ên Erebkirin û marjînalîzekirinê. Vê yekê bandor li jiyana wan a aborî, civakî û çandî kir, têkiliya di navbera dewlet û Êzidiyan de kir rageşiyek domdar di navbera parastina nasnameya wan a taybet û pratîkên bê eman yên dewletê de.

Li vir mirov divê bisekine û bipirse, Dewleta Iraqê ji damezrandina xwe heta 2003'an, çawa bi Êzidiyan re mijûl bû?

Di astên siyasî, aborî û çandî de çi siyaseta û tedbîr li hember wan girtin? Û van polîtîkayan çawa bandor li nasnameya Êzîdî û hebûna wan a civakî kir?

Di vê nivîsê de ez ê hewl didim ku bersiva van pirsan bidim, ku bi projeyên destpêkê û hewldanên dewletê yên ji bo koçberkirina Êzidiyan di salên 1920 û 1930'an de dest pê dike, ber bi serdema marjînalîzekirina siyasî û civakî ya berî Baasê ve diçe, û di dawiyê de digihîje polîtîkayên Erebkirin û dîrxistinê di serdema Baasê de (-1968 2003), bi balkişandina ser bandora wan polîtîkayan li ser civaka Êzîdî û berdewamiya krîza wan a dîrokî. Bi bersivên di vê çarçovê de ez bawer im ku wê têgihîştinek çêbibe.

Avabûna Dewleta Iraqê û Êzîdî (1935-1921)

Bi bidawîhatina Mandata Brîtanî û ragihandina Şanişîna Iraqê di sala 1921'an de, dewleta Iraqê ya nûjen dest bi avakirina bingehên desthilatdariya xwe ya navendî li ser hemû axa Iraqê kir, tevî herêmên bakur-rojavayê ku Êzîdî lê dijîn. Dewleta nû hewl da ku civakên cihêreng di bin nasnameyek neteweyî ya navendî de bike yek, lê bi dijwarî û astengiyên mezin re rû bi rû ma, di nav de pir rengiya etnîsîte, ol û heya eşîran, û her weha nebûna avahiyek îdarî ya bihêz li deverên dîr ên wekî Şingal û Şêxan.

Ji ber taybetmendiya wan a olî û civakî, Êzîdî ji saziyên siyasî û îdarî yên bi bandor hatin dîrxistin û di parlamento an rêveberiya herêmî ya nû de ti nûnertiyek fermî ji wan re nehat dayîn.

Vê nebûna qanûnî û siyasî rê li ber polîtîkayên dewletê yê destpêkê vekir ku wan wekî civatek ku hewceyê kontrol û entegrasyonê ye diditin, ne wekî pêkhatyek welatîyan a rengê xwe cuda, ku divê rêz jê re were raber kirin.

Yek: Projeya «Cezîrê» di sala 1925'an de Di sala 1925'an de, hikûmeta Iraqê projeyek çandiniyê ya bi navê Projeya Cezîrê da destpêkirin. Armanca wê ya diyarkirî berfirehkirina erdên çandiniyê li bakurê Iraqê û pêşxistina erdên Şingal û Şêxanê bû. Lêbelê, di pratîkê de, projeyê bi taybetî gundên Êzidiya hedef girt, erdên wan hatin veguheztin û radestî eşîrên Erebb ên wekî Şemer û hwd. hatin kirin, di heman demê de Êzidî ji cihên xwe yê kevneşopî dûrî wargehên nû hatin koçber kirin. Ev tedbîr wekî gefek rasterast ji bo hebûna dîrokî ya Êzidiyan li deverên wan ên resen, ji ber koçberiya bi zorê û veguherîna demografîk, hate hesabandin.

Bê guman vê bixwe re bertek û nerazîbûn di nava civaka Êzidî de pêşxist û bû sedem ku berxwedana herêmî pêşkeve. Serkêşê Êzidî yê navdar Dawidê Dawid (Dawud El-Dawud), serokê eşîra Mêhrkan li Şingal, wekî sembola berxwedana li dijî projeyê derket holê. Wî rêberiya tevgerê protestoyî ya çekdarî ya herêmî kir ku koçberiya bi zorê û koçberiyê red kir, ku bû sedema pevçûnên sînorkirî bi hêzên hikûmetê re. Ev bûyer wekî pevçûna çekdarî ya yekem a eşkere di navbera Êzidiyan û desthilata navendî de hate hesabandin, û amadebûna Êzidiyan ji bo parastina erd û nasnameya xwe nîşan da, ev bû qonaxa yekem. Ziraviyên vê serhildanê gelek in û li vir ew derfet nîne em bikevin nav de.

Lê Serhildana 1935'an a li dijî leşkeriya neçarî û heman sedema me li jor behs kirî bû qonaxa duyem. Deh sal piştî damezrandina dewletê, hikûmeta Iraqê di salên -1934 1935'an de leşkeriya neçarî li ser hemû welatîyan, tevî Êzidiyan, ferz kir, bêyî ku taybetmendiyên wan ên olî û civakî li ber çavan bigirin. Ev biryar bû sedema nerazîbûneke berfireh, bi taybetî li Çiyayê Şingalê, ku xelkê wê bi çandinî û şivantiyê ve girêdayî bûn û bi kevneşopiyên herêmî ve jî girêdayî bûn.

Ev Serhildana Êzidiyan ku di sala 1935'an de, bi serokatiya navdarên herêmî wek Dawidê Dawid, Memoyê Elî û hwd. dest pê kir û daxwaza sekinandina Proja Cizîra û xizmeta leşkerî ya bi zorê an jî qet nebe veqetandina yekîneyên serbixwe kir. Hikûmetê bi hêza leşkerî bersiv da, hêzên bi serokatiya efserên navdar ên wekî Bekir Sidqî şandin da ku serhildanê tepeser bikin, û rejîmeke leşkerî ya hişk li ser herêmê hate ferzkirin. Di encama vê serhildanê de; Nêzîkî 300-200 berxwedêrên Êzidî hatin kuştin. Her wisa gund û milk hatin wêrankirin, û dewletê qanûnên ewlehiyê yê hişk li ser Şingalê ferz kir. Û têgihîştina Êzidiyan wekî civatek serhildêr ku hewceyê kontrol û tepeserkirinê ye, di hişê dewletê de cih girt, ku paşê bandor li polîtîkayên wê kir.

Rewşa Siyasî û Civakî ya Serdemê

Serdema ji 1921'an heta 1935'an avakirina fermî ya tîkiliya dewleta Iraqê bi Êzidiyan re temsîl dike, ku bi çend taybetmendiyan tê xuya kirin:

Ya Yekemin: Nebûna naskirina qanûnî: Civaka Êzidî ti parastinek destûrî an nûnertiya siyasî negirt an jî jê mehrûm ma.

Ya Duyemin: Bi zorê sepandina polîtîkayên navendî: ji projeyên veguhestina erdê bi zorê bigire heya leşkeriya neçarî.

Ya Sêyemin: Pêşxistina berxwedana herêmî: Derketina holê ya rêberên herêmî yê wekî Dawid El-Dawid, ku hişmendiyê kolektîf a pêwîstiya parastina nasname û erdê nîşan dide.

Ya Çaremin: Destpêka krîzek baweriyê: Tepeserkirina xwînî ya serhildana 1935'an hestek domdar a tecrîd û terikandinê ji hêla dewletê ve afirand, ku bandorek demdirêj li ser tîkiliya di navbera Êzidiyan û desthilatdariya navendî de kir. Dikare were gotin ku vê serdemê, bingehên dîrokî ji bo polîtîkayên paşê yê li dijî Êzidiyan danîne, nemaze di derbarê koçberkirina bi zorê û Erebbkirina paşê di bin banê Partiya Baas de.

Serdema Piştî-Monarşiyê heta Serdestiya Baasê (1968-1936)

Êzidî Piştî serhildanê êdî lawaziya siyasî û civakî dijîn. Ji bo wê piştî tepeserkirina serhildana 1935'an, Êzidî ketin serdemê tecrîd û lawaziya siyasî ya nisbî. Rewşa wan a qanûnî neguherî, û ew li derveyê her mekanîzmeyeke temsîlkirina siyasî ya bi bandor man.

Ew wekî civatek olî ya serbixwe di nav dewletê de nehatin naskirin, lê pir caran di nav saziyên Kurdî de hatin tevlikirin an carinan ji bo armancên îdarî wekî Misilman hatin dabeşkirin. Bi heman awayî sînorkirinên erdê û desteserkirina milkê li hin gundan berdewam kir, ji ber ku dewletê kontrol li ser peymanên çandiniyê û erdên Çiyayê Şingalê ferz kir, û aboriya herêmî ya Êzidiyan qels kir. Ev rewş civaka Êzidî hişt ku ji bo parastina rêxistina civakî û parastina

milke xwe bi giranî girêdayî avahiyên eşîrî yê herêmî be, bi sînorkirina girêdayî dewletê ji bo xizmetguzarî, perwerde û edaletê.

Monarşiya Dereng (1958-1932)

Di dema monarşiya piştî serxwebûna Iraqê di sala 1932'an de; Iraq gelek caran bêistîqrariya siyasî û darbeyên leşkerî re rû bi rû man, ku eleqeya dewletê li deverên dûr ên wekî Şingalê kêm kir. Êzidî rastî du zextan hatin: ji aliyekî ve, berfirehkirina desthilatdariya dewletê bi rêya projeyên çandiniyê û qanûnên bacê; û ji aliyê din ve, pevçûnên eşîrî û herêmî li bakurê Iraqê. Her wisa prosodûrên Şah jî wek dihat hêvî kirin parastinek taybetî ji bo Êzidiyan peyda nekirin, û hêza rêveberiyê di destên fermanar û eşîrên Erebb û Kurd de kom bû, pirî caran li ser hesabê Êzidiyan.





Tevgera Azadiya Jinên Êzidî

TAJÊ Îradeya jinên Êzidî ye

Fermana 3'yê Tebaxa 2014'an ku di dîroka Êziyan de weke fermana 74'an tê pênasekirin, bingeha xwe ji zihniyeta zilamên desthilatdar ku bi hezaran sal in li ser gel û civakan pêşdixin, digire. Di encama zihniyeta dîroka şaristaniya navendî de ku ger li ser navê ol, ger li ser navê desthilatdarî, ger li ser navê nijadperestî, ger li ser navê netewdewlet û her wiha bi sedemê cur be cur ferman li ser civakan hatine pêkanîn. Bêguman, ev zihniyet zihniyetekî desthilatdar e, ne zihniyetekî olî, yan jî baweriyekê ye. Tenê yek hedefa desthilatdariyê heye; desteserkirina ax, mal û milkê mirovan e.

Bi vê sedemê ji hêla feraseta zihnî ya dagirker û qirker ve bi hezaran caran weke fermana 74'an êrîşên hovane li ser civakan hatine meşandin. Herî dawî fermana ku DAIŞ'ê li Şengalê kirî, berhama vê zihniyeteke ye. Di vê wateyê de, hemû ferman, qirkirin, tunekirin, rûxandin û her wiha tevkuji û tûndiya ku li ser civakan hatine kirin, bi vê zihniyeteke ve girêdayî pêşketiye.

Di Fermanê de qirkirina jinan

Di hemû komkuji û fermanan de herî zêde jin bûne qurbanî. Bi rêka asîmlekirin û qetilkirina jinan armanc ew e ku nasname, çand û baweriya civakê bê tinekin. Ji bo ku çand, ziman û baweriya civakê ya

kevnar ji holê bê rakirin êrîş li ser jinan tê kirin. Ev rastî di dîrokê de gelek caran tê dîtîn. Fermana 3'yê Tebaxa 2014'an ya bi destê çeteyên DAIŞ'ê jî yek ji van mînakên e. Di fermana 74'an de bi hezaran jin û zarok hatin dîlgirtin, di bazaran de hatin firotin û bi zorê ji çanda xwe hatin dûrxistin. Di destê DAIŞ'ê de rastî tacîz, tecawiz û kuştinê hatin. Her wiha bi dehan jinên Êzidî ji bo ku nekevin destê çeteyên DAIŞ'ê demarên destên xwe qut kirin, xwe ji zinaran avêtin û dawî li jiyana xwe anîn, teslimiyet qebûl nekirin.

Bi giştî Şingalî û zêdetir jî jin û zarok ji ber nebûna binesaziyeke bi gelek zehmetiyên jiyanê re rû bi rû dimînin. Bi kurtasî ji vê şidetê herî zêde jin û zarok bandor bûn. Ne tenê di ferman û qirkirinan de şidet tê meşandin, rast e şideta herî mezin û dijwar ew e, lê belê şideta psîkolojîk jî di nav de

li mal, civak û kargehan bi destê zilam tê meşandin. Li seranserê cîhanê, jin rojane rastî tacîz, tecawiz û kuştinê tên. Sîstema desthilatdar a zilam bêyî ku ferq û cudahî bixe nav netew, çand û çînan, li ser jinan şideta herî mezin pêk tîne. Şidet ne tenê fizîkî tê meşandin, a herî xurt di aliyê psîkolojîk de tê meşandin. Ev yek tê wê wateyê ku zihniyeta zilam a desthilatdar, bi ti awayî jinan qebûl nake û wek zindiyekê ango hebûnekê hesab nake. Ev xal me hemû jinên cîhanê digihîne hevdu. Qetlîam tenê di asta fizîkî de esas girtin şaş e. Li ser vê esasê her qirkirinek ku tê pêkanîn li ser hemû jinan e.

Piştî fermana 74'an beşa ku herî zêde bûn qurbanî dîsa jin û zarok bûn. Ji cî û warên xwe koçber bûn, bi xizaniyê re rû bi rû man. Bi salan e di bin konan de, di nav zehmetiyên rojane de hewldana jiyanê didin.



Ji ber xerabûn û nebûna binesaziya, navçe, gund û bajarê Şengalê dijîn, bi gelek pirsgerêkên tendirustî û civakî re rû bi rû dimînin. Li derveyî zehmetiyên jiyanî û tenduristiyê, di kampan de jin bûne qurbanê siyaseta PDK'ê û hêzên cîhanî. Weke amûreke şerê sar li hemberî destkeftiyên civaka Êzidî têne bikaranîn. Di mijara ehlaq de kar li ser wan tê kirin, wan ji çand û ehlaqê wan dûr dixin û wisa li wan dikin ku ji rastî û cewherê Êzdatiyê dûr bikevin. Ji rastiya Êzdatiyê şerm bikin, xwe tevahî çandê biyanî û xerîb bikin.

Her wiha pirsgerêkên nefsi yanî psîkolojîk pir li pêş in, roj nîne jin xwe nakujin û nayên kuştin. Her wiha beşekê jinan ji bo sîxurtiyê dişixulînin û wan li beramberî destkeftiyên civakê dişixulînin. Piştî sala 2014'an, civaka li Şengalê rêxistina xwe ava kir, carek din ji nû ve jiyana xwe li ser felsefa Rêberê Gelan Abdullah OCALAN destpêkirin. Weke jinên Êzidî me Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) ava kir. Îro em dikarin bêjin dayîkên me pêşengên berxwedana Şengalê ne. Em meclîsên xwe birêxistin dikin, di qadên çandî, tendirustî, aborî, ragihandin û dîplomasiyê de kar dikin.

Xebatekî herî muhim ku piştî fermanê hate destpêkirin rêxistina jin a civakî, siyasî hate avakirin TAJÊ îradeya jinên Êzidî ya rêxistinkirî temsîl dike. Di dîroka jinên Êzidî de cara yekemîn e rexistinekê wan a siyasî, civakî, xweser, xwedî biryar tê avakirin. Ev gava herî girîng bû piştî fermanê. Her wiha komîteya dîplomasiyê wek dengê jinên Êzidî li derve karê muhîm da meşandin. Ji bo ferman di raya giştî ya cîhanê de bi berfirehî were naskirin, peywendiyên xurt bi jinên cîhanê re, bi sazî û dezgehên re ava kir û dengê jin û civaka Êzidî gihand her derê.



Dîroka me, dîroka têkoşîn û berxwedanê ye

Me ji dîroka xwe ders derxist, heger em parastina xwe nekin kesek parastina me nake û mesela parastinê meselekî jiyanî ye. Wek av û nan ji bo em bijîn girîng û jiyanî ye. Ji bo wê me hêza YJŞ'ê weke heza parastina xwe û rûmeta xwe nas kir û xwedî lê derketin. Îro beşekê têkoşîna xebatên me ew e em her jinekê li ku dibe bila bibe li ser esasê himên parastina cewherî perwerde dikin. Her wiha jin, ji aliyê fikrî û zanistî ve li ser rastiya jin, welatparêzî, rastiya dîroka Êzdatiyê perwerde dikin, her wisa herî zêde TAJÊ jin û jinên ciwan teşwîqê çand, cil û bergê Êzdiyan dike, bawerbûn û serbilindiya ji çanda xwe, ji reûresmên xwe pêşdixe.

Her wisa ji bo gel were birêxistinkirin, rêxistina jin ava bikin, bi pirsgerêkên gel û jinan re mijûl bibin û civakê birêxistin bikin li her gundekî Şengalê meclîsên jinan hatine avakirin û ev meclîs bi pirsgerêkên jin û civakê re mijûl dibin, van pirsgerêkan çareser dikin û xebatên rêxistinkirinê li ser esasê pêwistiya civakê dimeşînin. Herî dawî em dikarin bêjin îro TAJÊ li Şengalê, di nav dilê şoreşa Şengalê de, şoreşa jin ava kiriye û pêşengtiyê ji têkoşîn û berxwedaniya Şengalê re dike. Ji bo civaka Êzidî bigihe mafên xwe, xweseriya Şengalê were pêkanîn, jin werin azadkirin barê herî giran dayê ser milê jinên ji xwe bawer. Bi hezkirin û welatparêziyê, jin li Şengalê ji gel û axa xwe re pêşengtiyê dikin.



ÊZDÎN ŞENGALÎ

Hikumeta Sûdanî û Peymana 9'ê Cotmehê

Di ser Peymana 9'ê Cotmehê ya di navbera Bexda û Hewlêrê de 5 sal derbas bûn. Civaka Êzidî vê peymanê weke berdewama fermana 3.8.2014'an nixand û navê 'Fermana Yasayî' lê kir. Di nav van 5 salan de bi her awayî zelal bû ku Peymana 9'ê Cotmehê ji peymanê demkî ya di navbera Bexda û Hewlêrê de wêdetir e, mutabaqateke stratejîk a herêmî ye ku mohra hêzên navnetewî jî li ser e.

Şengal ev 5 sal in li hemberî vê peymanê ku hebûna wan, îradeya wan û siberoja wan a azad înkâr dike, li ber xwe disekine. Di esas de hate xwestin ku bi vê peymanê re Şengal teslîm were girtin û civaka Êzidî ya ji fermanê derketî jî rehîn were girtin.

Di pêncemîn salvegera vê peymanê de bibîrxistineke cewherî ya vê peymanê, têkoşîna Şengalê û civaka Êzidî, nixandina rewşa heyî pêwîst e. Rola dewleta tirk û PDK'ê ya di vê peymanê de, hedef û armancên wan heya astekî tê zanîn, lê îro roj pêwîst e rola hikumeta Iraqê û siyaseta wê ya li ser Şengalê baştir û ziravtir were nixandin. Ji ber ku di rewşa heyî de siyaseteke hişk a tecrîdkirin, dorpêçkirin û leşkerîkirina Şengalê bi destê hikumeta Sûdanî tê meşandin. Ji xwe dema hikumeta Kazimî ji kar ket û hikumeta Sûdanî hate hilbijartin, herkes li bende bû ku ev peyman were betalkirin, lê hikumeta Sûdanî dest neda vê peymanê.

Hikumeta Kazimî hewl da vê peymanê bi hêza şidetê bixwe meriyete ku ev siyaseta bû sebeb di sala 2022'an de artêşa Iraqê Şengalê dagir bike û zemîna şer ava bike. Hikumeta Sûdanî Peymana 9'ê Cotmehê ji qada aborî heya ya îdarî, siyasî û civakî bi awayeke ziravtir dimeşîne. Di ser de dorpêça leşkerî ya li ser Şengalê jî girantir dike. Bi cewherî, hikumeta Sûdanî li ser ziman zêde behsa Peymana 9'ê Cotmehê nake, lê li qadê bi hemû rê û rêbazan leşkerî, siyasî û aborî dixwaze bixwe meriyetê.

Bi xalên sereke Peymana 9'ê Cotmehê

*Her çiqas PDK û hikumeta Kazimî wekî du aliyên fermî yên Peymana 9'ê Cotmehê xuya bikin jî, dewleta tirk a dagirker hêza esasî ya li pişt vê peymanê bû ku hêzên navnetewî jî destekê didan. Peymana 9'ê Cotmehê, pîlaneke herêmî bû ku hedefa esasî şikestina Rêveberiya Xweser a Şengalê û şikandina hêza parastina civaka Êzidî bû. Di esas de peyman, di 1'ê Cotmeha 2020'an de hatibû mohrkirin lê di salvegera Komploya Navneteweyî ya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan de ji raya giştî re hate ragihandin, ji ber wê ye wekî Peymana 9'ê Cotmehê hate binavkirin.

Li ser navê hikumeta Herêma Kurdistanê Wezîrê Karên Hundir Rêber Ehmed, li ser navê Iraqê jî Cîgirê Serokê Emnil Wetenî Hemîd Reşîd Faleh ev peyman îmze kirin. Rêber Ehmed di dezgeha Parastinê de berpirsê dosya Şengalê bû. Nûnera Taybet a Neteweyên Yekbûyî (NY) ya Iraqê,

Jeanine Hennis Plasschaert jî di mohrkirina peymanê de amade bû. Ji xwe heya dawîya erka xwe jî, Plasschaert ji bo têkbirina Şengalê şev û roj li gel PDK'ê û dewleta tirk xebitî.

NY, bi iddiaya ku wê li Şengalê aramî, îstikrar û ji vî ve avabûnê pêş bixwe piştgiriya vê peymanê kir. Lê piştî vê peymanê êrîşên herî giran li ser Şengalê pêşketin, pêşengên civaka Êzidî bênavber hatin şehîdxistin, cih û warên pîroz hatin bombebarankirin. NY, xwe xist bin berpiryariyê wisa ku hemû êrîşên dewleta Tirk û PDK'ê veşêre. Ji ber vê, NY ji êrîşên qirkirinê yên li ser Şengalê di asta yekem de berpirsyar e.

Civaka Êzidî, ji roja destpêkê ve li dijî vê peymanê derket û ev peyman wekî "Fermana Yasayî" binavkir. Civaka Êzidî dît ku di pişt xalên vê peymanê de ku bi zimanê 'siyasetê' hatibû amadekirin, fermaneneke nû heye.

“ Hikumeta Sûdanî li ser ziman zêde behsa Peymana 9'ê Cotmehê nake, lê li qadê bi hemû rê û rêbazan leşkerî, siyasî û aborî dixwaze bixwe meriyetê ”

“ji bilî xebatên Rêveberiya Xweser a Şengalê û şaredariyên gel heya niha xebateke ji nû avakirina Şengalê nehatiye meşandin”

Peymana 9'ê Cotmehê; li ser xalên 'Rêveberî', 'Ewlehî' û 'Ji nû ve avakirina Şengalê, hatibû amadekirin. Li gorî xala Rêveberî; wê qeymeqamekî nû ya 'serbixwe' bihata hilbijartin û li gorî destûra bingehîn û nîzama dadê tevbigere. Rastiya vê xalê ew e ku sîstema Rêveberiya Xweser were hilweşandin û civaka Êzidî careke din bikeve bin desthilatdariya dewletê. Ji xwe bi îmzekirina peymanê re hemû sazî û pêşengên Rêveberiya Xweser rastî êrîşên giran hatin.

Li gorî xala Ewlehî; li derveyî polîsê federal, ewlehiya niştimanî û bîrîmên istixbaratê, wê ti hêzeke din a çekdar ji ewlehiya herêmê ne berpirsyar be. Wê hemû hêzên din ên çekdar ji Şengalê werin derxistin. Hedefa vê xalê jî ew bû ku hêzên YBŞ-YJŞ'ê û Asayîşa Êzîdxanê, yanî hêzên parastina cewherî werin belavkirin. Piştî vê peymanê, bi dehan şervan û fermandarên pêşeng ên civaka Êzidî bi êrîşên hevpar ên hikumeta Iraqê, PDK û dewleta tirk hatin şehîdxistin.

Xaleke din a peymanê jî bi sernavê 'Ji nûve avabûnê' ye. Li gorî vê xalê jî, wê hikumeta navendî û PDK komîsyoneke hevpar ava bikin û dest bi avakirina Şengalê bikin. Lê ruxmê ragihandina bi dehan projeyan û veqetandina mîzaniya Şengalê jî, ji bilî xebatên Rêveberiya Xweser a Şengalê û şaredariyên gel heya niha xebateke ji nû avakirina Şengalê nehatiye meşandin, di ser de rê li ber vegera gel û avedaniya Şengalê hatiye girtin.

Weke ji xalên sereke jî xuya dibe, Peymana 9'ê Cotmehê di şêkil de weke peymanekê ku rê li ber vegera gel a Şengalê veke, îdareya Şengalê ava bike û pêngaveke mezin a avedaniyê bide destpêkirin xwe ji raya giştî re da nasîn. Lê eger em bere xwe bidin bûyer û geşedanên piştî îmzekirina vê peymanê, emê bi zelaî bibînin ku vê peymanê rê li ber vegera Êzidiyên li kampan girtiye, ewlehî û aramiya Şengalê têk buriye û bi sedhezaran Êzidî yê vegeriyan Şengalê bê xizmetgûzarî hiştiye.

Piştî Peymanê êrîşên li ser Şengalê

Bi îmzekirina Peymana 9'ê Cotmehê re hevkarîya leşkerî û istixbarî ya dewleta tirk, hikumeta Iraqê û PDK'ê gihîşte asa herî bilind ku di encama vê hevkarîyê de êrîşên pir giran li ser Şengalê hate kirin. Civaka Êzidî van êrîşan weke berdewama fermanê û temamkirina hedefên DAIŞ'ê binavkir.

16-ê Tebaxa 2021'an yek ji fermandar û pêşengên civaka Êzidî Seîd Hesên, li Sûka Kevn a Şengalê ku sembola rizgarkirina Şengalê ye, di êrîşeke hewayî ya dewleta tirk de şehîd ket.

17-ê Tebaxa 2021'an dewleta Tirk bi balafirên şer li Nexweşxaneyê Sikênîyê xist. 5 şervanên YBŞ'ê ku tedawî didîtin û 3 karmendên tenduristiyê şehîd bûn, nexweşxane bi temamî hilweşiya.

7-ê Kanûna 2021'an, wesayîta Hevserokê Desteya Rêveber a Şengalê Merwan Bedel (Dijwar Feqîr) bi mayînan hate teqandin. Di êrîşê de Merwan Bedel şehîd bû û du zarokên wî yê li gel wî, birîndar bûn. Sîxurên MÎT û PDK'ê li xwe mikur hatin ku wan ev êrîşê pêk aniye.

11-ê Kanûna 2021'an, Meclisa Gel a Xanesorê bi mayînan hate teqandin, ziyanên mezin gihîştin avahiyê. Sîxurên MÎT û PDK'ê li xwe mikur hatin ku wan ev êrîşê pêk aniye.

1-ê Sibata 2022'an, dewleta tirk a dagirker yek ji êrîşên xwe yê herî giran kir. Bi dehan balefirên şer ên dewleta tirk saet 22:00'an de dest bi bombebaran a Çiyayê Şengalê kirin. Vê êrîşê 6 saetan bênavber berdewam kir. Di encamê de sê welatîyên karker şehîd bûn.

2-ê Gulana 2022'an bi fermana Serokwezîrê Iraqê Mustefa Kazimî, artêşa Iraqê li gel bi sedan tank û wesayîtên zirxî êrîşê Dîgurê û Sinûnê kir. Şengal bi temamî ji aliyê artêşa Iraqê ve hate dagirkirin.

15-ê Hezîranê 2022'an de Meclisa Gel a Sinûnê bi mayînan hate teqandin. Zarokê bi navê Selah Naso û welatîyê bi navê Îbrahîm Derwêş şehîd bûn û 8 kesên din birîndar bûn. Sîxurên MÎT û PDK'ê li xwe mikur hatin ku wan ev êrîşê pêk aniye.

27-ê Sibata 2023'an, balefirên keşfê yê dewleta tirk li gundê Behrewa yê Xanesorê wesayîtek bombebaran kirin. Di vê êrîşê de fermandarên YBŞ'ê Pîr Çeko û Agir Cefrî şehîd ketin.

17-yê Îlona 2023'an di encama êrîşeke hewayî de sê fermandarên YBŞ'ê Dîndar Avesta, Çiya Feqîr û Pîran Pîr li Serdeşt a Çiyayê Şengalê şehîd bûn.

1-ê Adara 2023'an, dewleta tirk a dagirker bi hevkarîya PDK'ê li navenda Şengalê wesayîtek kire armanc. Di vê êrîşê de ji rêveberiya Asayîşa Êzîdxanê Şêrzad Şemo Qasim şehîd ket.

Balefirên şer, balefirên keşfê, mayîn û sabotaj...

“Piştî Peymana 9'ê Cotmehê, ji destpêka sala 2021'an heya dawiya sala 2023'an bi giştî 25 êrîşên giran hatin kirin. Ji balefirên şer heya balefirên keşfê, ji mayînan û heya sabotaj û sûîqastê hemû amûr û rêbazên şer li ser Şengalê û civaka Êzidî hatin ceribandin.”

Piştî Peymana 9'ê Cotmehê, ji destpêka sala 2021'an heya dawiya sala 2023'an bi giştî 25 êrîşên giran hatin kirin. Ji balefirên şer heya balefirên keşfê, ji mayînan û heya sabotaj û sûîqastê hemû amûr û rêbazên şer li ser Şengalê û civaka Êzîdî hatin ceribandin. Ji belgeyan û îtirafên sîxuran derket holê ku bi van êrîşên giran hedef belavkirin û hilweşandina Rêveberiya Xweser a Şengalê û bi taybet jî hêzên parastina gel in. Her çiqas di van êrîşan de hevkarîya dewleta tirk û PDK'ê li pêş be jî, hem ji aliyê istixbarî û leşkerî ve, hem ji aliyê siyasî ve rol û berpirsyariya hikumetên Kazimî û Sûdanî di van êrîşan de heye.

Hikumeta Sûdanî peyman betal nekir

Piştî ku hikumeta Kazimî ji kar ket û di 27'ê Cotmeha 2022'an de hikumeta Sûdanî dest bi kar kir, hêvî û bendewarî ew bû ku hikumeta nû Peymana 9'ê Cotmehê betal bike. Banga civaka Êzîdî ya li Sûdanî jî li ser vê esasê bû. Di destpêka desthilatdariya xwe de, Sûdanî gelek peymanên serdema Kazimî betal kirin, lê ruxmê ku Peymana 9'ê Cotmehê di Parlemena Iraqê de nehatiye dengdan û nebûye nivîseke fermî ya dewlet û hikumeta Iraqê jî, ji aliyê hikumeta Sûdanî ve weke bernameyeke stratejîk hate berdewamkirin. Du sedemên esasî hene

ku Sûdanî vê peymanê betal nekir û weke belgeya stratejîk a Şengalê ji xwe re esas girt. Ya yekemîn, Sûdanî ji bo hikumeta xwe ava bike û ji dewleta tirk û PDK'ê destekê bigire, soz daye ku vê peymanê berdewam bike.

Ya duyemîn, hikumeta Sûdanî ku li beramberî Êzidiyan berpirsyariya xwe ya siyasî, aborî, civakî û ehlaqî pêk neaniye, ji bo Rêveberiya Xweser a Şengalê ji hev belav bike û Şengalê bixe bin serweriya xwe piştî xwe daye vê peymanê. Her wiha, ev peyman beşek ji stratejiya herêmê ya hêzên navnetewî ye ku rê li ber tevgerên demokratîk û azadîxwaz a gelan digire. Bi cewherî, ew mutabaqata di navbera hêzên herêmî û hêzên navnetewî de ku di rêgiriya lêgerîna azadiyê ya gelan de hevpar in, berdewam dike.

Leşkerîkirîna Şengalê û îdareya leşkerî

Yek ji xalên ku hikumeta Sûdanî, siyaseta hikumeta Kazimî berdewam dike, mijara leşkerîkirîna Şengalê û kûrkirina xebatên istixbarî ye. Bi hinceta parastina sînor, rêgiriya bazirganiya ne yasayî û pêşlêgirtina xeteriya DAIŞ'ê, hikumeta Sûdanî roj bi roj hêza leşkerî ya di nav Şengalê û derdora wê de mezintir dike. Weke herêmeke ku şerê germ lê hebe, an jî weke herêmeke ku serî li dewletê rakiribe artêş û istixbarat xwe



li Şengalê bicih dikin. Bi dehezaran leşker û hêzên istixbarî, bi dehan seytereyên polis û leşkeran, rojane lêgerîna seyareyên xelkê medenî û di nav gundên Şengalê de ji Êzidiyan pirsirina nasnameyên wan, Şengal bi destê hikumeta Sûdanî kiriye herêmeke leşkerî.

Hêza artêşê û istixbaratê ji jiyana rojane ya gel heya qada siyasî û aboriyê li her derî xwe nîşan dide. Bi cewherî li Şengala ku îdareya wê ya resmî nîne, yanî bê qeymeqam e, îdareyeke leşkerî heye. Ev dîmena ku em behs dikin ya li welatên ku şerê navxweyî lê hene ya jî li welatên ku hatine dagirkirin xuya dikin. Gelo di çavê hikumeta Sûdanî de Şengal qada şerê navxweyî ye an jî qadeke serhildêr e ku lazim e serî lê were pelçiqandin, ev pirsên nîqaşê ne. Lê di rastiyê de Şengal welatê fermana ye ku hewl dide ji xwe re jiyaneke azad û ewle ava bike.

Dîlgirtina 5 şervanên YBŞ'ê

Her wiha siyaseta û nêzîkbûna hikumeta Sûdanî ya li dijî hêzên YBŞ-YJŞ û Asayîşa Êzîdxanê mijara herî girîng û herî hesas e. Şervanên YBŞ'ê ku di fermana 2014'an de ne tenê rûmeta Şengalê, her wiha rûmeta Iraqê jî li ber DAIŞ'ê parastin, rastî êrîşên bêbext, lîstikên qirêj tî. Dewleta Iraqê ji her kesî baştir dizane ku ka çawa artêşa Iraqê karî vegere Şengalê, ka çawa ala Iraqê car din li Şengalê bilind bû. Lê ruxmê vê heqîqetê jî, helwest û nêzîkbûna hikumeta Sûdanî li hêzên parastina Şengalê, dûrî ehlaq û wijdanê ye. Herî dawî di 18'ê Adara 2025'an de dema şervanên YBŞ'ê li ser erka xwebûn, li navenda Şengalê ketin kemîna hêzên artêşa Iraqê, hin ji wan birîndar 5 şervanên YBŞ'ê ji aliyê artêşa Iraqê ve dîl hatin girtin

u heya niha, ruxmê hemû sozên hatî dayîn jî 5 şervanên YBŞ'ê nehatine berdan. Ev rewş, cewhera siyaseta hikumeta Sûdanî ya li ser Şengalê bi zelalî radixe ber çavan

“ Yek ji xalên ku hikumeta Sûdanî, siyaseta hikumeta Kazimî berdewam dike, mijara leşkerîkirîna Şengalê û kûrkirina xebatên istixbarî ye ”

Êrîşên li ser îradeya siyasî û civakî

Civaka Êzîdî bi avakirina hêzên parastinê û rêxistinkirina Rêveberiya Xweser bersiva fermana 3.8.2014'an dan. Ji ber vê, Rêveberiya Xweser a Şengalê ne tenê rêveberiyêke teng a siyasî, îdarî û leşkerî ye lê ji bo civaka Êzîdî nav û nasnameya hebûnê ye. Ji bo pêkhatayên Şengalê jî sîwana pêkvejiyanê ye. Hikumeta Iraqê li şûna ku bi vî awayî nêzî Şengalê bibe, Rêveberiya Xweser a Şengalê ji xwe re kiriye hêzeke dijber. Eger em siyaseta leşkerîkirina Şengalê baş tehlîl bikin, dibe ku em bêjin ji dijbertiyê jî wêdetir siyaseteke dijminane tê meşandin. Ji ber vê, hem hikumeta Kazimî hem hikumeta Sûdanî rê li ber hemû êrîşên li ser Şengalê vekirin, carna bi destê artêşa Iraqê xwe êrîş kirin, carna istixbaratê bi dijminên Êzidiyan re parve kirin. Hikumeta Kazimî jî ya Sûdanî jî ji xwe re hesabeke

wisa kirin û hê ji dikin, wê dewleta tirk bi hevkarîya PDK'ê êrişê Şengalê bike, wê Rêveberîya Xweser bişkê û civaka Êzidî jî careke din xwe bispêre sîstema dewlet û desthilatdariyê. Ku ev hesab pêk nehat, vê carê bi hêrs û bi şidet siyaseta leşkerîkirina Şengalê kete meriyetê. Beguman hedefa vê siyasete jî teslîmgirtin e.

Guhertina demografyaya Şengalê

Dema hikumeta Sûdanî nû hate ser kar, çend biryar û projeyên ku dilê Êzidiyan xweş bike ragihand. Sûdanî tevli civîna Encûmena Parêzgeha Mûsilê bû, bi nûnerên Êzidiyan re kom bû û ji bo çareserîkirina pîrsgirêkan gelek soz dan. Şandeyên cûda li ser navê civaka Êzidî û Şengalê, li Bexdayê bi Sûdanî re hevdi tin kirin. Bi rastî jî, civaka Êzidî di destpêka hikumeta Sûdanî de ket nav hêvî û bendewariyekê. Cara yekem hikumeta Sûdanî ragihand ku ewê tapoyên milk û emlakên Êzidiyan li wan vegeînin. Wezareta Koç û Koçberan biryar da ku heya havîna 2024'an hemû kampên li Başûrê Kurdistanê werin girtin û Êzidî vegeîrin Şengalê. Ji bo Şengalê sindoqa aboriyê û mîzaniya salane hatin veqetandin û hwd. Yanî ewê hêviyê dan civakê ku wê Êzidî vegeîrin Şengalê û Şengal ji nû ve were avakirin. Lê di 20'ê Tebaxa 2025'an de Wezareta Koç û Koçberan ragihand ku wan biryar daye koçberên li kampan entegreyî cihê ku lê ne werin kirin. Yanî li şûna ku derdora 150 hezar Êzidî vegeînin Şengalê, wê koçberan li cihê ku lê ne bicih bikin. Bi vî awayî pîlaneke xeter a guhertina demografyaya Şengalê û parçekirina Êzidiyan ragihandin. Yanî ku dîtin Şengal û Êzidî teslîm nabin, vê carê biryara parçekirinê dan.

Parçekirina Welatê Êzidiyan

Hikumeta Iraqê ku heya niha fermana 2014'an weke jenosîde qebûl nekiriye, beguman ne mimkûn e ku wate bide hebûna civaka Êzidî ya li ser cih û warê xwe. Civaka Êzidî di her fermanek de parçeyek ji welatê xwe wenda kiriye, yanî di her fermanek de beşek ji laş û gewdê wan çûye. Êzidî Çiyayê Şengalê ji xwe re weke stargeh dibînin, îca xuya ye dor hatiye parçekirî û tinekirina vê kelehê. Li aliyê din, biryara Wezareta Koç û Koçberan xwe dispêre hafîzaya dewleta Iraqê ya dîrokî. Weke tê zanîn di salên 1975-1974'an de, ango di serdema Sedam Hisên de, Êzidî ji gundên Çiyayê Şengalê hatin qutkirin û li deştê hatin bicihkirin. Ji 1975'an heya roja me 50 sal derbas bûn, di nav 50 salan de gelek hikumet û rejim guhertin. Lê xuya ye kîjan hikumet li ser kar be, siyaseta li dijî Êzidiyan naguhere. Piştî biryara Sedam Hisên a qutkirina Êzidiyan ji Çiyayê Şengalê, îro roj hikumeta Sûdanî jî biryar dide Êzidî ji Şengalê qut bibin, li bajarên mezin ên Iraq û Başûrê Kurdistanê an jî li welatên Ewrûpayê bihelin. Îro roj hemû dinya li dijî siyaseta Îsraîlê ya li ser Fîlîstîniyan û êrişên li ser welatê wan bertek nîşan dide. Hikumeta Sûdanî bi caran siyaseta parçekirina welatê Fîlîstîniyan, guhertina demografyaya wan rexne kiriye. Lê îro heman hikumeta Sûdanî welatê Êzidiyan parçe dike, demografyaya Şengalê diguhere, rê li ber nemana welatê Êzidiyan vedike.

Gef, zext û dorpeçkirin

Gelek mijarên cûda hene ku em dikarin destnîşan bikin ka Peymana 9'ê Cotmehê bi destê hikumeta Sûdanî çawa tê rêvebirin. Lê civaka Êzidî jî êdî xwedî wê hişmendî,

hêz û baweriyê ye ku vê siyaseta nas bike û rê li ber bigire. Çawa ku hikumeta Kazimî di siyaseta xwe ya Şengalê de biserneket û ew bi xwe ji desthilatdariyê ket, wê hikumeta Sûdanî jî di siyaseta teslîmgirtina Şengalê de bisernekeve. Ya rast û ehlaqî ew e ku hikumeta Sûdanî tavilê dest ji vê peymanê bêbext berde û berê xwe bide tîkiliyê demokratîk a bi civaka Êzidî û Şengalê re. Rêber Abdullah Ocalan bi banga Aştî û Civaka Demokratîk derî û dergeheke nû hem ji bo gelên herêmê hem ji bo dewletên herêmê vekir. Ger Iraq pêngava Rêber Ocalan baş tehlîl bike û berê xwe bide azadî û demoakrasiyê, wê karibe rê li ber her cûre destwerdanên ji derve bigire. Lê eger di serî de li Şengal û Mexmûrê, êrişên xwe yê li ser gelên bindest û hejar berdewam bike wê Iraq ji her demê zêdetir rastî destekariyan were.

Şengal berê xwe daye Ronesanê

Hikumeta Sûdanî bi gef, zext û dorpeçkirina Şengal û Mexmûrê xurt nabe, lawaz dibe. Eger hikumeta Sûdanî xwe ji Mexmûr û Şengalê bihêztir dibîne û êriş dike, wê hêzên jê xurtir jî êrişê Iraqê bikin. Pêwîst e hikumeta Sûdanî zû bikeve vê ferqê de. Eger nekeve vê ferqê û ji bo di hilbijartinan de careke din bibe hikumet, serê xwe li ber daxwazên dewleta tirk û PDK'ê deyne, vê bisernekeve. Civaka Êzidî bi banga Aştî û Civaka Demoakratîk a Rêber Ocalan re û bi taybet jî bi banga Ronesansa Êzidiyan re ketiye merheleyeke nû ya parastin û pêşxistina hebûna xwe. Pêwîst e herkes baş nas bike ku, civakê ku ji fermanê ber bi şoreşê, ji şoreşê ber bi vejînê dimeşe serê xwe li ber siyaste zext, gef û dorpeçkirinê ti carî natewîne.





Xelîl Baran

Wateya cejna cimayîyê ji bo me çi ye?

Cimayî angî kombûn, her cejnê cimayîyê ji bo civaka Êzîdî wateya xwe çî ye û xwedî giringîyeke çawa ye? Gelo dema em diçin cimayê pîroz dikin em giringiya wê dizanin û ka em difikirin ji bo çî em diçin cimayê? Gelo em dizanin di civat û nîqaşên xwe de me çî gotiye û me çî daye nîşandan? Ev mijarek gelek girîng e û divê baş were fehmkirin. Ji ber ku her cimayek me serhildanek e, her cimayek me berxwedanek e, her cimayek me xwedî derketinek li çand û kevneşopiya me ye. Her kesek ku diçe pîroz kirina cimayê, pêwîst e di zanebûna van mijaran de be. Ji cil û bergên me heya rabûn û rûniştina me ya di civatê de, çûn û hatina me, silav û nîqaşên me heke em di zanebûnê de bin, ev tişt ji bo me pir giring in.

Gelo divê em bi cilên çawa derkevin cimayê?

Rast e ziman nasnameya me ye, lê cil û bergên me hem ziman, hem reng, hem jî çand û ala me ne. Gelo em çiqas bi rengê xwe, bi cilên xwe yê Ezdatiyê derdikevin? Gelo em rengê xwe yê Ezdatiyê li kombûn an jî cejna cimayîyê nîşan nedin, emê li şûna çanda xwe û cilên xwe yê pîroz çî nîşan bidin? Çanda me ya ku heta roja îro me ew parastiye û me xwe pê parastiye, emê ji bo kê bihêlin û li hêvîya kê bihêlin, eger em neparêzin wê kê biparêze?

Roja cimayê ya yekem dişibin roja Şîlanê angî roja govend û dîlanê. Kêyf û xweşiya me ne tenê ew e li ber mosîqê em xwe hilavêjin. Govenda me ji bo çî ye?

“ Gelo em rengê xwe yê Ezdatiyê li kombûn an jî cejna cimayîyê nîşan nedin, emê li şûna çanda xwe û cilên xwe yê pîroz çî nîşan bidin ”

Eger em di govenda xwe de ne Êzîdî bin, di govenda xwe de em kesek biyanî bin û dengê me ne yê me be? Eger ji serê govendê heya talîya govendê bi rengê xwe yê Ezîdî û Ezdatî be, ew govend govenda me ye. Ev xweşî û Şîlana me ye, divê her kesekî tu bibînî li her dîmenek ku tu lê mêze bikî, her stran û dengê tu bibihîzî, şîret û nesîhet, reng û dengê rast ê Ezîdî û Ezîdxanê be. Çawa em di nav qubê de çiraya xwe ya ronahiya pîroz vêdixin divê em rastiya xwe wisa zelal û ronî bikin. Lê mixabin nêzîkbûna me ya li çanda ku bi hezaran salan me di bin şûrê Ferman û Talanan de parastiye û heya roja îro em bi vê çand û bahwerîyê xwe wek Ezîdî mane, ku îro roj jî di bin êrîşe de ye, ji bo me rexneyeke cidî ye. Nabe em di cejn û sersalên xwe de bi şiklê xwe yê civakî lawaz bin, çawa ku em ji bo bîr û baweriya xwe fedayî ne divê ji bo parastina çanda xwe jî em wisa fedayî bin.



Gelo çima em kom dibin?

Kombûne me ya cimayê ne tenê ji bo rojekê ye ku em bêjin îro cimayî bû, derbas bû û çû. Di nav civate de kes û aliyên ku di navbera wan de nakokî hene, ji bo xatirê roja pîroz a cimayê li hev kom dibin, nîqaş dikin û li hev û din guhdar dikin. Ev kombûn jî li cihekî pîroz û li rojê pîroz çêdibe ku ji bo xatirê cejna cimayê, rêzê li hevûdu digirin, ev jî dibe rê xweşkirinek ji bo nîqaş kirin û çareser kirina pirsgerêkên civakî yên navxweyî û pirsgerêkên ji derve. Lê di rewşa heyî de gelo li ser van mijaran çiqas nîqaş tê kirin? Gelo çiqas rê li nifşê nû, angû ji ciwanan tê vekirin ku pêşniyar û fikrên xwe parve bikin? Em dibînin piranî di van civatan de mezin, mixtar û kesayetên siyasî yên ku li berjewendiyên xwe yên şexsî digerin, diaxivin û rê li ber wan ciwanan tê girtin.

Gelo wê demê wê çawa ciwan bibin pêşengên civakê, wê çawa di aliyê çanda xwe de, di bîr û baweriya xwe ya civakbûn û Ezdatiyê de werin parastin? Gelo em qet fikirîne ka çima ciwanên me ji axa xwe, ji çand û baweriya xwe direvin.

Çima ji cimayî, ji cejn û sersalên xwe direvin û berê xwe didin koçberiyê ber bi welatên Ewrûpayê ve?

Çima ji cimayî, ji cejn û sersalên xwe direvin û berê xwe didin koçberiyê ber bi welatên Ewrûpayê ve? Di van kombûn û civatan de, kesên emir mezin û malxuyên malan, piranî her du kes di ber xwe de bi hev re nîqaş dikin, di vê rewşê de wê piraniya ciwanan jî nizanibin ji bo çi

hatine wê derê, ji bo çi cimayiyê pîroz dikin.

Ya din, gelo em qet fikirîne ka di van cimayîyan de çiqas rê li ber jinê tê vekirin, çiqas pirsgerêkên jinê tînin nîqaş kirin? Gelo dema jineke têgihîştî û pêşeng di civatê de şerm bê dîtin wê çawa heqê wê jinê were dayîn ku me ew jin di bîr



û bahweriya xwe de hertim pîroz dîtiye. Jina ku heya niha çand û baweriya me ji her kesê zêdetir parastiye di van şert û mercên de her tişt ji bo wê qedexe û cihê

şermê be, derketina ji malê çênebe wê

çawa karibe bîr û baweriya

xwe ya Ezdatiyê, çanda

xwe ya civakbûnê

biparêze? Gelo

dema kofiya

sipî ya

li serê

daykên

me

ne,

dema

cil û

bergên

pîroz ên ji

rengê kesk,

sor, sipî û zer ku

ji xwezayê girtine

û heya niha parastine

nemînin, wê demê Ezdatiya

rast a li ser bîr û baweriya xwe ya

civakî wê li ku derê were dîtin?


Miletekî ku di her warî de ne xwedî

bingeheke mayînde be, miletekî ku hêza

wî ya civakî û parastinê xurt nebe, di

warê siyasî, leşkerî û îdarî de xurt nebe wê çawa karibe li hemberî êrîş û fermanan bisekine? Ew civak wê çawa karibe ji zarok heya mezinan xwe birêxistin bike, hevîyê ji xwe re ava bike? Wê civaka xwe ya koçber çawa vegeerîne ser cih û ware xwe? Wê çawa karibe heqê xwîna şehîdên xwe bide, xewn û xiyalên şehîdên xwe pêk bîne? Li şûna ku em di civat û kombûnên xwe de van pirsgerêkan çareser bikin û bibin xwedî hêza xwe rêvebirin û xwe parastinê, çima emê nizanibin ji bo çi em kom bûne, cejn û cimaya me ji bo çi ye?

Em dibînin ku piştî cimayîyan carna alozî di navbera kesan de rû dide, gelo ev pirsgerêk û alozi yek ji wan sedeman nîne ku ciwan nayên perwerde kirin? Gelo yek ji wan sedeman nîne ku tifaqî çênabe? Eger em di zanebûna rê û resmên baweriya xwe de bin wê ev pirsgerêk bikevin asta herî kêr. Ger em li ser esasê baweriya xwe zarokên xwe perwerde bikin û di van cimayîyan de çanda civakî pêş bixin wê çaxê em dikarin bêjin cimayî wateya xwe digire û pêk tê. Dîsa yek ji mijarên esasî, cihê ku em lê şahî dikin, pîrozbahîyan dikin em van jîngehan naporêzin. Gelo me ji xwe pirsîye çima piştî şahî û kombûnên me jîngeh ewqas qirêj dibe, dar tînin birîn. Yek ji qanûnên bîngehînan e cimahiyan jî xwe parastin e. Eger xwe parastin jîngehparezîye negire nav xwe ma em dikarin bejin me cimayî pêk anî? Pêwîst e bi qasî fikir û hişmendîya ku em ji cimahiya digirin tevbigerin, li gor wê jî jiyana xwe bi rêxistin bikin.



Evîn Simoqî

25'ê Mijdarê û têkoşîna Jinên Êzidî

Weke tê zanîn 25'ê Mijdarê, roja tekoşîna li dijî tundîya li ser jinê û hevkarîya navnetewî tê pênase kirin. Jinan, bi têkoşîn û berxwedaniya xwe karîne vê rojê bikin rojeke cihanî, mêjî û dilê mirovahiyê bi vê rojê bidin hesandin. Her çiqas weke rojek bê ditîn jî, ji aliyê têkoşîna jinan ve serkeftineke gelek mezin e. Ji ber ku hem ji aliyê malbatê ve hem jî ji aliyê mêt-dewlet ve jin bi domdarî li rastî feraset û kiryarên cinsiyetparêzî tên. Jin ji aliyê ruhî, fîzîkî û fikrî ve tê dorpeç kirin û heta pêkanînen kuştin, xwe kuştinê diçin.

Gelek xelex li dora jinê hatine danîn wek zincîrên koletiyê, ji ber wê xwe jê xilaskirin tekoşîneke gelek mezin dixwaze heta di oxira vê de bedel jî bê dayîn. Taybet di civakên bindest de rewşa jinan hîn xiraptir e. Herî

bêtir jin û zarok rastî siyaseta şer û tundiyê tên û qurbanîyan didin. Pergala mêt di asta heri jor de hêrs û kîna xwe ji jinê derdixîne, ji ber dijminê jiyanê ye. Armanca şer û tundî kuştina jiyanê ye. Li cihê ku jin bê hedef kirin li wê derê jiyanê tê hedefkirin. Peyva jin û jiyan du peyvên efsûnî di nav hevde ne û nikarin ji hev bîr qut kirin ku girêdaneke dîyalektîk di navbera her du rastiyan de heye.

Roja 25'ê Mijdarê bêguman ji bo jinên Şengalê xwedî wateyeke girîng û taybet e. Dema ku fermana 2014'an bi ser me de hat, wek jinên Êzidî xebera me ji rojek wisa dirokî ku di cihanê de tê bibîranîn û jin xwedî li vê rojê derdikevin, tune bu. Lê her çiqas dîroka me tijî ferman, komkuji, destdirêjî, revandin û koçberî be jî, dîroka me her wiha

bûye dîroka berxwedanî û tekoşînê jî Li hemberî teslimiyetê, jinên Êzidî ti carî xwe radestî dijminê xwe nekirine. Jinên Êzidî serê xwe dane bes sira xwe nedane. Gelek jinên wêrek û navdar di dema şeran de rola berxwedaniyê leyistine, parastina xwe û civaka xwe kirine. Yêk ji van jinan jî Zarîfe Osê ye, heta bûye mijara destan û dengbejiyê. Lê çawa dîroka fermana nehatiye nivîsandin, dîroka me ya berxwedaniyê û têkoşînê jî nehatiye nivîsandin û ser hatiye nixumandin. Ji ber ku siyaseta înkâr û tinekirinê di her demê dîrokê de li ser me hatiye ferzkirin. Ji ber wê em dibêjin girêdanek gelek xurt di navbera têkoşîna jinên Êzidî û xwişkên Mîrabal de heye.

Kiryara hovana ya li ser xwişkên Mîrabal hatî kirin, herî zêde jinên Êzidî dikarin fêm bikin û xwedî li vê rojê derbikêvin. Belku jin di mekan û wextên cuda de bi nasnameyên cuda têkoşîn û berwedaniya xwe kiribin, agahiya wan ji hev nebe û hev nas nekiribin. Lê bi heman ruh, îrade û zanabûnê hevdû temam dikin. Ji ber nasnameya jinê li her derê cihanê yek e û ti ferqek di navberê de tineye. Wek xelexên berxwedaniyê bi hevdû ve tîr girêdan û di çemê şehristaniya demokratîk de diherikin. Ji ber pîrskirêka jinan gerdûnê ye û tekoşîna wan jî gerdûnê ye.

Bûyera xwişkên Mîrabal, di 25'ê Mijdara 1960'an de pêk hat û bi tekoşîna jinan ev roj bû roja têkoşîna cihanî ya li dijî tundîya ku li ser jinê tê meşandin. Lê piştî wê bi 50 sal şûn ve heman hişmendî û pratîk li Şengalê, ji aliyê çeteyên hov ên Daîş'ê ve hem jî bi şewazeke komkuji li dijî jinên Êzidî pêk hat.

5000 hezar jin hatin revandin, tecavuz kirin û kuştin. Hatîn kole kirin û di bazaran de hatin firotin. Herî zêde jin bûn hedefa vê fermanê. Karesateke mirovî hate jiyîn û di wijdanê mirovahiyê de birîneke kûr vekir. Pergala mêt desthilatdar li dijî jin, civak û xwezayê hatiye avakirin. Heke bûyera 25'ê Mijdara 1960'an di qada navnetewî de xurt bihata lêpîrsîn kirin û hesap ji pergala mêt dewlet bi hata xwestin, piştî wê bi 50 sal şûn ve heman kiryar û bûyer li Şengalê nedihat dubarekirin. Her çiqasî di navberê de ferqa zeman û mekan hebe jî lê hişmendî yek e û xwe berdewam dike û dubare dike. Pergala mêtê desthilat li ser hêz û keda jinê xwe bi neheqî rêxistin kiriye û pergala desthilatîyê avakiriye. Rê û rêbazên koletî, ser tewandin, tundî, zordarî, destdirêjî, kuştin û tinekirinê pêk tîne. Hem jinê dikuje hem jî dixwaze pê re jiyan bike. Hişmendî û pergaleke 9000 hezar sal a nexweş û riziyaî ye. Jin, civak û xweza jî bi xwe re ber bi tinebunê ve dibe.

“ Lê her çiqas dîroka me tijî ferman, komkuji, destdirêjî, revandin û koçberî be jî, dîroka me her wiha bûye dîroka berxwedanî û tekoşînê jî Li hemberî teslimiyetê, jinên Êzidî ti carî xwe radestî dijminê xwe nekirine ”

Sedemên vê yên pir kûr dirokî, hişmendî û civakî hene. Rêber APO vê weke pergala kujer a tebeqeyî bi nav dike. Dirok û civakbûnek jinê ya xwedawendî, pîroz heye û diçe berê mîladê 30 hezar salan. Heqîqeta jinê di despêka dirokê de veşartî ye. Weke dîroka mîtolojî ya bê nivîs û nehatî nivîsandin tê gotin. Mirov ji xwezayê çêbûye. Lê jin bi wextê re bi hiş û keda xwe ji xwezayê cuda dibe û civakbûna xwe avadîke. Mîtolojî, ziman, çand, huner, sîhir pêşdixe li dora jiyana niştecih, çandinî û xwedî kirina ajalan jiyane pêktîne.

Jiyana komunal birêxistin dike û li dora jinê komên biçuk yên civakê tên avakirin. Wate; ehlaq û xweşikbûn dibe cewher û şiklê vê civakbûnê. Mirovên bi fikir, hest û îrade ji nava vê civakê derdikevin. Jin civakê rêxistin dike, civak jî jinê avadîke û çêdike. Dayikên xwedawend bi afirînerî û xuluqkariya xwe derdikevin ser dika dîrokê. Jiyana helbestî, hunerî, bi wate, bi ehlaq û azad despêdike. Bêguman jin bi serê xwe nîne.

Mêr jî wek dualiteya jiyane heye lê rola wî ji derveyî rastiya bîyolojîk û hindek tevgerînên fîzîkî zêde tineye. Tevgerîna mêr zêdetir li derveyî civakê, li ser nêçirvaniyê pêşdikeve. Tevgerêk bê hilberîn û berhem e. Wek din mêr weke zarokek li ber destê dayika xwedavend mezin dibe û fêr dibe.

Lê bi wextê re mêr dibe xwedi tecrube û ezmûn, rista wî derdikeve pêş. Lê rol û hêza xwe li dijî jinê pêşdixîne û serî li tundiyê dide. Hunerên nêçirvaniyê li ser jinê pêk tîne û di bin navê jiyana malbatî de jin dixê nav qafesa xwe de. Pergala serweriyê avadîke

û rê li pêşiya desthilatîyê vedike. Têkiliya diyalektîk ya jin û mêr vedigere têkiliya koletî, serdestî û bindestî. Mêr hêza fikir bi dest dixê bi rêya mîtolojî, ol, felsefe û zanist rê dide koletiya jinê û pergala desthiladariyê rewa dike. Bertek, nerazîbun û refleksa jinê ya herî biçûk a li beramberî vê pergale bi tundî, gef, kuştinê tê bersivandin. Rêya sêyem ji jinê re nahelê ya heta dawî teslîm bigire yan jî bikuje. Di şexsê jinê de jiyana civakî û nirxên komînalbûnê tên tune kirin.

“ Êzdatî koka hemû baweriyên e ku li ser erdnigariya Mezopotamyayê jiyandikin. Di vê watê de ronesans hem vegera li koka xwe ye hem jî şoreşa zihniyetê ye. Şoreşa jinên Ezidî bi xwe ronesans e û bersiva herî mezin li dijî 74 fermana ye ”

Di ser fermana 2014 .08 .03'an re 11 sal derbas bûn. Bi mudexeleya şervanên Rêber APO pêşî li fermanê hate girtin. Şervan û fedaîyên jin di vê berxwedaniyê de di refên herî pêşde li hemberî hişmendîya kujer a Daîş'ê şer kirin û li cihanê nav û dengê wan belav bû.

Me ji tekoşîna azadiya jinên Kurdistanê hêz, bawerî kelecaneke mezin girt û li ser îdeolojîya azadiya jinê xwe birêxistin kir, pergala xwe ya parastinê û xwe rêvebirinê avakir. Di qada perwerdeyê de me akademyên xwe avakirin. Bêguman beriya me, tecrûbe û ezmûnên 30 salên tekoşîna azadîya jinên Kurdistanê hebû û ji bo me bû şans û derfeta herî mezin a sed salî em bi dest bixin.

“ Jinên Ezidî pêwîst e tekoşîna xwe bi tekoşîna jinên Rojhilata Navîn û cihanê re bikin yek û têkiliyên hevbeş û yêkgirtî hî n bêtir pêş bixin. Ji bo vê jî pêşxistina tifaqê bi jinên heremê re, rehendek stratejîk a tekoşîna jinên Ezidî ye ”

Di şexsê jinên Kurd de ronesansa Rojhilata Navîn dihate jiyandirin. Li Şengalê tekoşîna jinên Ezidî jî dibû rengê Êzdatî ya vê ronesansê. Êzdatî koka hemû baweriyên e ku li ser erdnigariya Mezopotamyayê jiyandikin.

Di vê watê de ronesans hem vegera li koka xwe ye hem jî şoreşa zihniyetê ye. Şoreşa jinên Ezidî bi xwe ronesans e û bersiva herî mezin li dijî 74 fermana ye.

Li Şengalê di encama tekoşîna 11 salan de jin bûn xwedi fikir û pergala xwe parastinê û ji bo hemû jinên Rojhilata Navîn bûn çavkaniya hêz û moraleke mezin. Jinên Ezidî di nav birîn û êşên fermanê de rabûn ser xwe û xwe birêxistin kirin. Eş, xem û birînên xwe veguherandin zanabûn, hêrsa tekoşinê û sonda azadiyê. Di dîrokê de belku nimûneya vê yêkê tunebe, civakek ku ferman li serê wê rabe û zû rabe ser xwe, bibe îrade û hêz.

Jinên Ezidî îspat kirin ku çiqas di nav şert mercên zehmet de be jî dikarin xwe bi hêz bikin û birêxistin bikin. Li pêşiya azadiyê ti hêz û zehmetî nikarin bibin asteng. Bes ku zanebûna wê ya tekoşinê hebe. Ji derveyî bê tekoşinbûnê ti tiştêk nikare bi jinê bide wînda kirin. Her jina ku tekoşinê bike, azad dibe û xweşik dibe.

Jinên Ezidî hem li ser kevneşopiya xwe ya berxwedanê xwe bi hêz kirin hem jî tekoşîna jinên cihanê, weke berxwedaniya xwişkên Mîrabal, ji bo xwe kirin çavkanî. Dîyar e di tekoşîna jinan de qutbûn nîne, tekoşîna jinan ji hev bandor dibin hevdû xurt dikin û temam dikin.

Berxwedaniya xwişkên Mîrabal pir bi wate ye û di dîroka gelekî de rol listiye û bûye rojeke cihanî, bêguman di me de ruhê tekoşinê avadîke. Lê divê em zanibin dîroka me bi xwe dîroka berxwedanê ye û kevneşopiya tekoşinê ava kiriye.


Bes em diroka xwe nasbikin, bixwînin û jê fêr bibin. Hesap pirsîn û hesap xwestina jinên Ezîdî li hemberî fermanan beguman divê dirokî û mezin be. Ev jî li ser esasê avakirina jiyaneke azad, civakeke demokratîk û pergala xwe parastinê ye.

Zimanê bêçaretî, belengazî û gazincê bi me nade qezenc kirin. Jin heke xwe bike hêz û îrade, dikare hesap ji pergala kujer û desthilatîyê bipirse. Rêbaza wê jî xwe birêxistin kirin û meşandina têkoşîna azadiyê ye. Jina bê tekoşîn û bêrêxistin jina mirî û windakirî ye.

Rêgezên jinê fikir û îradeya azad, rêxistin, têkoşîn, ehlaq û xweşikbûn e. Pêwist e jinek bêrêxistin û li derveyî rêxistinê nemîne. Rê û rêbazên tekoşînê yên dewlemend pêşbixine civakek azad û demokratîk ava bike. Yêkalî têkoşîn encam nagire, pêwist e di her alî de têkoşîna îdeolojîk, civakî, siyasi, leşkerî û huquqî nav hevde bimeşîne.

Têkoşîn û berxwedaniya jinan li van axan bûye wek çandek; destan helbest, dengbêjî, xeribî û stran, bûne zimanê vê tekoşînê. Mixabin feraseta deshilatîyê zêde rê nedaye ku jin di qada çand û hunerê de xwe bînin ziman, bi rengê xwe hunerê bihunin. Bêtir zilam dest avêtiye vê qadê û bi xwe ve daye girêdan.

Rêber APO dibêje yêk ji rêbazên esasî ku mirov xwe bigihîne heqîqetê, huner e.



Hişmendîya cinsiyetperezî, huner ji bo jinê wek şermek daye nîşandan û jinê ji vê qadê dûr xistiye ku nekariye di vê qadê de hebûna xwe bide nîşandan.

Lê ji çirok, dengbêjî û serpêhatiyên civaka me em dizanin ku berxwedaniya jinan, hunera jinan navê xwe li diroka civaka me daye.

Qada çand û huner ji bo jinan qada tekoşînê ye. Pêwist e jin di vê qadê de tekoşîna xwe xurt bikin û heqîqeta xwe bi hunerê bêtir bidin nîşandan. Ku em baş dizanin ku bingeha muzik û helbestê jinan pêşxistiye. Tabletên Sumeriyan vê rastiyê radixe ber çavan. Di gelek peykerên qedîm de, jin di destê wan de bi amûrên muzikê xuya dikin. Ya din, helbest li ser zimanê jinê hatine nivisandin û gotin.

jinê yê esasi jî afirînerî ye. Di vê qadê de xebatên weke konferans û komxebat bêtir keda jinê kolektiv û komunal dike û hilberina jinê pêşdixîne. Gelek platform û konferansên jinan di herêmê de çêbûne, jinên Ezîdî tevlîbûne û helwesta xwe bi hemû jinan re kirine yek. Tevgera jinên Ezîdî hem li hundir li dijî feraseta cinsiyetparêzî têdikoşe hem jî li derve li hemberî zext û êrişên li ser jinê tên meşandin tekoşîneke xurt dide meşandin.

25 Mijdarê li seranserî cihanê bi çalakî û tekoşîna jinan tê bîranîn. Jinên Ezîdî jî her sal ji bo vê rojê rêzê çalakî û bername pêşdixin, li ser esasê xwedî li diroka têkoşîna jinan derkeve.

Jinên Ezîdî pêwist e têkoşîna xwe bi têkoşîna jinên Rojhilata Navîn û cihanê re bikin yek û têkiliyên hevbeş û yêkgirtî hîn bêtir pêş bixin. Ji bo vê jî pêşxistina tifaqê bi jinên heremê re, rehendek stratejîk a têkoşîna jinên Ezîdî ye. Ji ber yêk aliyê esasî ya tekoşîna jinên Ezîdî jî rêgeza enternasyonalîzm e.

Pêwist e jinên Ezîdî xwe di ber pirsgerêkên jinên heremê û cihanê de jî berpirsyar bibînin. Nexasim di vê mijarê de baldarbûn û berpirsariyariya tevgera jinên Ezîdî xuya dibe. Ji ber ku tifaq û têkiliyên stratejîk çiqas pêş bikevin, tevgera jinan pê xurt dibe. Pêşketina jinan li qadek yan jî welatek yekser bandora xwe li ser tevahiya jinan dike.

Pirskirêka jinan çawa yek e, çareseriya wan jî hevpar e. Tevgera jinên Êzîdî ruxme hemû dorpêç û zextên dewleta Iraqê yên li ser Şengalê jî kariye xwe bigihîne jinên Iraqî, pêwendî û têkiliyan çêke û jinan bikişîne nav xeta têkoşînê. Lê dewleta Iraqê bê ku hesabê fermana 2014'an bide jinên Ezîdî û hesap ji hişmendiya Daiş'ê bipirse, ji bo astengî ji tekoşîna jinan re çêbike çî ji destê wê tê dike.

Şengalê dorpêç dike û zemîn ji fermanên nû re amade dike. Lê ruxmê vê jî em dikarin bêjin têkoşîn û berxwedaniya jinên Ezîdî îro hêz, baweri û moraleke pir mezin dide tevahî jinan û civakên heremê jî.





Kolektîfa Saza Êzî

Çîroka Strana Wawîska Bavê Qeşemê

Bi hezaran şer û bi hezaran berxwedanên civaka Êzîdî bûne stran û bûne destan, ev destanên qehremanîyan, hem qehremanîyên jina Êzîdî hem yên mêrê Êzîdî ne. Ji xwe ji bilî stranê tiştêk jî nikarîbû evqasî bi nazenînî parastina vê çanda lehengiyê bike û berdewam bike.

Erê qirkirin bûn, ferman bûn, bi hezaran Êzîdî dihatin qetilkirin, dîsa jî Êzîdî karibûn bahweriya xwe, dîroka xwe bi stranê biparêzin. Lê mixabin bi riya van fermanan, şerê asîmîlasyona çand û dîroka Êzîdîyan jî bi polîtîkayên taybet hatin ceribandin û van politikayan heta astekê jî encam girtin. Niha strana Şingalê weke berê reseniya xwe ne bi çîrok ne jî bi helbestê neparêze.

Ev çî bi riya hinek stranvanan hatibe pêşxistin an jî bi dizîna stran û dîrikên vê civakê gelek êriş û leyistik li ser strana Şingalê hatina gerandin mixabin. Niha jî di encama vê dîrketina ji çanda strana qedîm, ew ruh hêdî hêdî dibe tine. Weke minakekê piçûk, ez bejim strana Seyrê û Eliyê Mamed çilo bû. Hem serîrakirina li hemberî qalib û dogmayên feodalîzmê malbatê derketina Seyrê û Eliyê Mamed ji bo jiyanekê azad bû û ev bi pêşengî û wêrekiya Seyrê çebû.

Lê mixabin niha çiloya weke ku tenê du evindarên ku hev direvînin, nagihin hev û bi êş û keder xelas dibe. Seyrê jî tenê jineke xweşik e û hew. Lê heke em werin esasa stranê hinekî cudatir e.

Seyrê pêşengiya vê rabûna li hemberî wan dogma û qaliban dike û Elî jî digre diçe. Di encamê de êşên mezin dikşînin, dîsa jî ji ya xwe danakevin. Seyrê hem dewlemend e hem ji her deverê kesên axa û zengîn tî xwestina Seyrê lê ew hemûya red dike, evîneke azad û jiyanekê zor lê azad hildibijêre.

Sebeba evqasî dîrxistina ji esasa stranê çî ye, çimkî bi riya wan stranên dîroka te tîne ber guhê te, te pê dihisîne. Fikrekê hişmendiya koka te, civaka te ya dîrokê ji te re dibêje. Ji loma her tiştê gerek şerê taybet li ser çand û hunera civakan bi berdewamî bike. Ji bo bîra te biçikîne, baweriya te tine bike, te bike xizmeta xwe û tu qet nikaribe li hember rabe, bi her cûre bê fêhmî û paşverûtiyê te ditevizîne.

Ji loma jî em dixwazin xebatên xwe yê derxistina heqîqeta stran û dîrkan bi awayekî kûr û zanebûnî pêş bixin. Wawîska Bavê Qeşemê jî yek ji van stranên bû ku çîroka wê diçe dîroka beriya sedan sala li Welatê Xalta, ew lehengiya mêrê Êzîdî ku li hemberî êrişan li ber xwe sekinî û ferman şikandiye. Wawîska Bavê Qeşemê jî gelek tiştan û gelek kesayetên ku heqîqet bûn tîne bîra me, bîra me zindî dike û wî ruhê diparêze. Her wekî din gelek stran hene ku em ê vegeerînin ser koka wan, ji ber niha gelek stran ji heqîqeta xwe hatine dîrxistin. Wê ev xebat bi awayekî kûr berdewam bike û em ê vana bi ruhekî komînal, bi civakê re parvebikin.

**Feroyê Iskên bavê Elî Mêrxasê Neqîban!
Ka bavê Qaşemê?
Ka Ridwanê (Ridwana) bavê Temo?
Ka Welatê Xaltan û Zewa mîra?
Şemza bavê Misto û Xirbehê Feqîra?
Ka serdarê Sîwaran, Bavê Qaşemê
Feroyê Iskên û Keleşê Çelo, bi Eliyê
Gelho gula xorta, kû diparastin ew ax a
pîroz?
Ka çiyayê Xendeqîyan, keleha
mêrxasan?
Ka Basbût û Gedûk, Kelok û Awiskê?
Ew jî çûne pê re, Welatê Xerzan, maye
îro ji kê ra?**

Xerzan yek ji wan cihan e ku xwedî dewlemendiyek çandiniyê û Erdnîgariyek berfireh e. Ji gelek Eşîrên cude, kû di nav de gelek Olên cude jî he ne re malovaniyê dike. Wek mînak:

Elmedîna, navendê Ermeniyan bû.
Ridwan, navenda Êzîdîyan bû. Qesra Henqasrê, navenda pencinanan bû.
Keleha Comaniyê, navenda Reşîk û Raşkotanan bû.

Çiyayê Sason (Hezoyê) navenda Mala Êliyê Ūnis bû. Êlih, Bajar bi xwe di dsetê mala Ferhoyê Hîzêr Axa de bû.

Xaltî, ji 4 milan ve pêk tîne:

Xendeqî, Anqosî, Qizilî û Neqîbî.
Eşîrên Êzîdîyan Xaltîyan, di navbera wîlayeta Sêrtê û B atmanê (Elihê) de li derdora navça;

Qurtelan, Eruhê (Elmedîna) û Bişêrî (Qubînê) de dijiyan. Ezdiyên Xaltî dibêjin ku, peyva “Xaltî” navê eşîrê, yan qebîlê nîne. Xaltî navê war e, cih e. Navê Herema wan e.

Dewleta Tirk jî vala nedisekinî. Dixwest ku her bi çi awayî dibe bila bibe herêmê bixe bin dêsten xwe.

Ji bo vê yekê jî li heremê gelek fitnê û fesadî dan destpêkirin. Mixabin eşîrên Kurdan anîn hemberî hevûdû û li herêmê carek din şerê eşîrî geş kir. Weke mînak, Mala Faro ku Pencinarinê û Mala Dibo ku ew jî anîn hemberî hev. Mala Quto û Mala Nezîr anîn hemberî hev. Sunnî û Ermen, Êzidî û Sunnî anîn hemberî hevûdû.

Herem tevli hev kir.

Hetanî îro jî tê gotin ku li herêma Xerzan ji gundên Êzidiyan 366 gund hebûn. Îro mixabin tenê çend gundên biçûk mane. Elmedîna, navenda Ermeniyên bû û îro mixabin tu kes tê de nemaye.! Malbata wek Mala Êliyê Unis û Mala Faro, ji kokê ve tine kirin.

Serê hemûyan jê kirin û ji Paşayên xwe re birin. Ji sala 1820'î hetanî derdora 1930'î, ji yê ku li hemberî vê pergale rabûn û herem ji fitnê û fesadiyê parastin, tenê Mîrzîkê Zaza kû Serokê Xaltan bû. Neqîbiyan, Mala Êliyê Unis û Ahmedê Iskan ku ji Eşîra Pencinaran bû herem parastin. Piştî ku Bişarê Çeto hat kuştin û Cemilê Çeto jî dîl hat girtin û wî avêtin Zindana Amedê, ji nû ve qirêjiya dewletê fahmkirin. Lê dereng bû.

Piştî Fermana Şêx Mîrzayê êdî Paşayên Osmaniyan ferman li ser fermanê dan destpêkirin û herem dorpêç kirin. Mixabin divê em rastiye bêjin ku yekitiya Kurdên heremê çenebû, tifaq ava nebû.

Ji Fermana Herênza Şêxan bigire hetanî ya Bajarê Ridwanê, qirkirina Êzidiyan dan destpêkirin. Dewlet bi planên xwe mijûl bû û eşîrên Kurdan yê heremê jî bi hev lebigî bûn. Di vê nivîsê de ez dixwazim hinekî behsa demên berî salên 1900 bikim.

Eşîra Neqîbiyan ku gelek lehengên xwe di vê rê de dan, li hemberî dewleta Tirk sekinîn û şer kirin. Îroj di nava stranan de navê gelek lehengên wan tê gotin. Wek Feroyê Iskên, Qasim, Kolos, Qaso û Bişar. Feroyê kurê Iskanê Zoro bû mala Zoro mezinê Neqîbiyan bûn, Zoro kurê Mirzê Axayê Mirzê ji kurê Telî Axa bû. Fero, Qasim û Bişar birayê hev bûn.

Dara Bişar bi vî rengî berdewam dike. Zoroyê Bavê Bişar, Bişar, Iskan-Aqo, Kolos, Kinhê, Hemê, Celal. Apê Celal îro jî dijî û li derveyî Welat e. Mixabin dara Fero û Qasim ne diyar e. Feroyê Iskên, li dijî Dewleta Osmaniyan û êrîşên wan li ser Welatê Xalta û dagirkirina herêmê roleka mezin lîst û peşengî kir. Ji Êzidiyan hêz ava kir. Qasî 30 salî rêbertiya heremê kir û herem ji ber êrîşên dewletê diparastin.

Dema kû bahsa Neqîbiyan dihate kirin, xelkê bi çavêkî mezin qîmet didan wan û camêriya wan. Dema digotin Neqîbî, yekser Hebareşê Xaltan dihate bîra wan. Xelkê ji qehremanê Neqîbiyan re digotin Hebareşê Xalta.


Cihê kû Heberaşê Xaltan tê re derbas dibûn av disekinî. Kesekî newêribû hesab ji wan bixwazê. Nav û dengê Hebareşê Xaltan hiştiye ku gelek dayîkên ku li ser kurê xwe stran gotine, pesnê wan bidin.

Feroyê Iskên ku di nav civaka Êzidî de cihekî wî yê piroz heye û hîn hetanî îro jî ji çîrokên serhildana wî tene gotin û behskirin. Qahremantiya wî hiştiye ku gelek dengbêj navê wî di nav stranan xwe de bi cih bikin û bêjin.

Hertim dema ku li xelkên heremê bûye pesêrtangî û ketine zehmetiyê hawara xwe gihandine Neqîbiyan ku ji wan re Habareşê Xaltan dibêjin. Şema dayika Filît jî dema kû li delavê başo, çola texeri yê li ser laşê Filît disekine, ew jî dibêje xwezî ji xwe ra, navê Xwedê re wextê li bavê Hesên bû pesêrtangî hingî çend peya yê Neqîbiyan Lê derkitina yê wek Kolos û Aqo. Di derdora sala -1850 1860'an de Fermana Hisayê Mîrzayê Mîro û Hesênê Pûrto tevli Qeymeqamê Nîzamê li herêma Xaltan rabû ji gotinan hêzek gelekî mezin bi xwe re rakirin ser heremê. Xaltî çûn cem Gelho. Bavê Eliyê Gelho, Apê Gelho kû şervanekî bi nav û deng bû. Jêhatî bû û êdî kal bûbû.

Tenê guhê wî baş mabûn. Çav kêmbûbûn. Destên wî dirihilîn. Ji çok ketibû. Mêrxasên Xaltan xwestin şewra xwe bi Apê Gelho bikin.

Ji ber ku emrê wî di şerên giran de derbas bûbû. Apê Gelho, ji gotinan gelekî fikirî û got: Herin şer bikin, lê bila Xaltî li pêş, Neqîbî li paş bin. Dema kû Neqîbî bibînin kû xwîn ji Xaltan hat, wê gelekî bi hêrs şer bikin. Neqîbî paşmêrê baş in.



Stran:


Weylo lo weylo weylo lo weylooo
 Bila nehatibûya bayê Zozana, belê bayekî kûr e.
 Bila nehatibûya bayê zozana, bayekî kûr e.
 Bila neke lê neketiye li wan Qalacê Bakisyanê.
 Li we Zewa Mîra li Ridwana bavê Temo.
 Li wê Herenza Şêxan bila ne weşanda pelê Qizwan û Tihokan.
 Gelho dibêje, ji xêra Xwedê û xwedanê me Şêx xisin ve wextê li Eliyê min û Xortên Êzidiyan
 bû pêsîrtengî roja mirinê ez wê rojê ji wan re wergeriyabûma ser dema xwe yê berê.
 Ez li Bozê siwarbibûma û min dabûya pêşiyê serefa Dakan û Qizilan û Serefê siwarê neqîbiyan dabûna dû min.
 Em ketibûna dû dijminan û neyaran, me xilaskira Ridwanê Bavê Temo. Baxemsa Bavê Eyo û Mihama hetanî bereka Adiya, hey kesera dilê min wa Eliyo.
 Heyfa min tê wê hayfê, Gelho li ser laşê Elî sekinê û dibêjê kurê min rabe, de kurê min rabe,
 kula Eliyê min kuleka giran e, te helayê ji bavê xwe re hey derdê dilê min wa Eliyo.

Vê carê plana qirkirinê mezintir ji ya Herenzê û Ridwanê bû. Ji ber ku hejmara Êzidiyan jî hindik mabû. Ev çend sal bûn ku Ferman li dû Fermanê rakiribûn.

Gulê go Hezarê deranê ji alîkî ve êrîşên Eşîrên Sunni yên heremê nebes bûn. Vêca Fermana Dewletê jî rabû li ser Welatê me. Fermaneka bi xafiltî, ji nişkê ve hat. Ji heremê gelek kesên bi kîn dabû peşîye wan.

Civaka kû hîn birînên wan ji Fermana Ridwanê nekewin, zarokên ku hin tirs di çavên wan de ku rehat nikaribûn razên, dîsa eriş û eş. Wê rojê Xwedê zû dengê hawara Neqîbiyan bihîst.

Feroyê Iskên, Sîwarê bozê deng li temamê heremê kir û got bila her kes ji hidama xwe de êrîş bikin û teslîm nebin. Fero hemû şervan kom kirin û tedbîra xwe danîn. Payayê xwe yê herî sivik Êliyê Gazo şand kozika peşî û yên din li derdor belav kirin ji bo kû heremê bernedin.



Stran: Feroyê Iskên

Awiska Bavê Qeşemê li berê latê Gulê sê dangan ban kir li Hezarê kir e gazî.
 Hezarê deranê gulî da birê î girana Eskerê Hisayê Mirzayê mîro û Emerê Pûrto Qeymeqamê Nezamê, hayla gulî da birê eb beyana rojê re bi sê Tabûran hatin ser welatê Xalta. Ji jêr û jor de ketin tê de, ji jêr û jor de ketin tê de. Ma ne, gelek hene şade û şûde, Feroyê Iskên sîwarê Bozê bavê Elî û Qaşemê sê denga ban dike gelî sekmanê Êzidiyan gelî ba v û biran, xebateka mêran bikin lap hilînin, destê xwe ji Cakmakê kavik ziwînê hilînin, si st nekin çavên xwe ji Eskêren tirkan, nehîlin min derbeka giran lê da li Qumandarê dewletê li wî Rêsulê Elî, min got bila ev hayfa Eliyê Gazo, kurê jinêbiyê wî şervanê me yê kozika pêşî be. Me pozê Eşîretan perikand, perên me qut kir, cird û berdê hikumetê. Ezê bi Awiska bavê Qaşemê ketim li kolê da, ma ne î giran e Eskerê Hisayê Mirzayê mîro û Emerê Pûrto Qaymaqamê Nezamê de Hezarê bi sê Tabûran ve hatin ser welatê Xalta, ji Jêr û jor de ketin te dê, ji jêr û jor de ketin tê de. E w şade û şûde, Feroyê Isken siwarê Bozê bavê Elî gelek hene. Sê dangan li Sekmanê Êzidiyan kire gazî bi xebitin û lap hilênin destê

xwe ji Cakmakê kavik Ziwî sist nekin, çavê xwe ji Eskerên tirka n negerînin, me neqînin, weyla li min rebenê. Me derbeyek lê dabû li Qumanderê Dewletê, me got ev h eyfa Eliyê Gazo kurê jinebiyê wî şervanê me yê kozika pêşî ye. Nayê nayê Hawara Qasoyê neqîba nayê. A dûr e du re, ji banê xêra şewitî li îmdada bavê Elî sîwarê Bozê nayê. Ma ne gelek hene şade û şûde Feroyê Isken sîwarê Bozê bavê Elî sê denga ban dike, gelî sekmanê Êzidiyan gelî bav û biran xebateka mêran bikin lap hilînin, destê xwe ji Cakmakê kavik ziwî ne hilînin, sist nekin çavê xwe ji Eskêren tirkan, nehêlin meneqînin. Ma nayê bîra we, me wê rojê bi destên Eskerên Tirkan girtin û der an in ji mala Maksî kermoyê file, ji bin wan xendek û kadinên kayê.

Bi wî rengî Feroyê Iskên siwarê Bozê, Fermanê dişkêne û he remê bernade ji Tirkan re. Fermana Hisayê Mirzayê Mîro û Emerê Pûrto, jî pûç bû û şikest. Lê mixabin bihevçûna Êşîrên heremê berdewam bû û nesekinî. Hetanî roja îro jî li ser Gundê Kelhokê berdewame û hinek kes dixwazin Êzidiyan ji heremê dûr bikin, bi zor dêrxin...

Keleş Kiwexî



Zilan Şengalî

Komîn qada jiyane ye ku civaka ehlaqî û polîtîk lê ava dibe

Di gerdûna zindiyan de jiyana bi komî her hebûye. Heywan jî, însan jî bi komî dijîn, em dikarin bêjin nebat jî bi komî dijîn. Lê di navbera jiyana komî û bûna gel-civak de ferq heye. Bûna gel bê rêxistin çênabe. Rêxistin jî tê wateya jiyana û karê bi mebdê, şêwir û fikrê. Piştî ku civaka însan bi pêşengtiya jin-dayik ve ji xwe re mebdê, şêwir û fikir esas girt, wê demê ji jiyana komî derbas kir û bû civak. Vê pêşdetir jî bir, ji bo fikir û şêwir rast û bi feyde be dît ku mebdêyên esasî pêwîst in. Kar çawa were tesbît kirin, çawa were kirin, çi rast e, çi şaş e, divê çi pêşiyê û çi paşiyê were kirin, ev hemû pirsên jiyana ne.

Heger bersivên rast ji van pirsan re neyên dayîn, wê biryarên şaş werin girtin û karên şaş werin kirin. Ev jî dikare bibe sedem ku ew koma rêxistinî an jî gel-civak, derbeke giran bixwe. Eger derbên giran nexwe jî wê enerjî û keda wan bi avê ve biçê. Ji ber vê, rast bersivdayîna karên gel û civakê jiyana ye. Însan, hê di destpêka civakbûnê de vê rastiyê fem kiriye û ji bo parastina civaka xwe

pîvanên esasî diyar kirine. Ji van pîvanan re jî gotina "Ehlaq." Bi şêwir û pêk ve karkirinê re jî gotine "Polîtîka." Bi vî şeklî, yanî bi ehlaq û polîtîkayê, komên însan û heywanan ji hev cuda bûne. Li aliyê din, dema însan dibe civak bi pêşxistina çand, huner û estetîkê jiyane xweşik dike, jiyane geştir dike. Zanebûn pêşdikeve, zanist pêşdikeve. Yanî bi rêxistinbûnê, hemû tiştên ku îro roj jiyana me xweş û rehet dikin, tîn pêşxistin. Eger însan, weke zindiyên din tenê ji bo ewlehiyê bi hev re bûya, ewçend pêşketin çenedibûn û însan ji hemû zindiyan pêşketîtir û zanatir nedibû. Di encam de, însan an jî komek însan çiqas ji tevgera rêxistinî dûr bikevin, ewçend jî însanbûn û civakbûnê dûr dikevin. Ji ber vê Rêber Apo got; " Te çiqas birêxistin kir, civak ewqas dibe civak."

Di roja me ya îro de sebeba hemû xirabî û pirsgerêkan jî ew e ku însan nayên ba hev, bi hev re li ser rewşa civakê nîqaş nakin, bi hev re biryar nagirin û karên pêwîst bi hev re nakin. Di aqil û dilê însan de, nexweşiyê

bi navê "Tenê xwe fikirandin" peyda bûye. Ev nexweşî weke kurmê darê ye, xwe bi xwe dixwe. Encax bi vegera li însanbûnê em dikarin ji heqê vê nexweşînê derkevin. Yanî bi jiyana komînal û civakî, bi xwe rêxistinkirinê. Di roja me ya îro de em jê re dibêjin jiyana komîn.

Ya yekemin; Komîn xwe dispêre tevlibûneke ji dil. Hemû endamên komînê bi bawerî û dilxwazî tevlî komîne dibin.

Ya duyemin; komîn medreseya civakê ye, civak tê de hem demokrasîya raste rast pêşdixe hem jî rêveberiya xweser fêr dibe. **Ya sêyemîn;** komîn ciheke wisaye ku şexs tede wateya hebûna xwe dibîne. Komîn, ew cih e ku şexs û civak armancên xwe tê de pêk tînin, komîn qada azadiyê ye.

Ya çaremîn; komîn ocaxek e ku tede hezkirin, edalet, mafê mirovan tê pêşxistin. **Ya pîncemîn;** komîn cihe pêşxistina wekhevîya jin û zilame, cihê ava kirina hevjiyana azad e. Bi cewherî komîn, ji bo civakê cihê pêkvebûna azade, cihê wekhevîyê, alîkarbûnê û parvekirinê ye. Yanî çi tiştên baş ên civakê hebin, anîna li ba hevûduye. Li ser van pîvanan, avakirina pergala civakî ya li derveyî dewletê ye. Komîn ketina di nav dewletê de esas nagire, çareserkirina pirsgerêkan civakî û avakirina pêşerojê esas digire.

**“ Komîn ne tenê
pêşwazîkirina pêwistiyên
jiyane ye. Komîn avakirina
jiyaneke nû ya manewî
ye jî. Ji ber vê, rêxistin
û yekîneya esasî ya
bingeha civakê û pergala
Reveberiya Xweser
komîne ”**

Di komînan de hemû beşên civakê dikarin cih bigirin. Kedkar, gundî, dikandar (esnaf), alimen olî, mezinên eşîran, hunermend, xwendekar, mamosta, jin, ciwan bi cewherî hemû beşên civakê re rêxistinên herî guncav komîn bi xweye. Komîn li ser esasê nêrînen partiyekî ava nabe. Yanî, endamen hemû partî û rêxistinên cûda dikarin di nav komîna gund de cihê xwe bigirin. Ji bo hemû endamên komînê şertê esasî ew e ku her dem, menfaatên civakî esas bigirin. Her endamek komînê bi hûrmet û hezkirin nêzikê hemû endamên komînê bibe, komîn ji heta dawiyê xwedî li endamên xwe derbikeve, endamên xwe biparêze û wan bide jiyana kirin.

Komîn ne tenê pêşwazîkirina pêwistiyên jiyane ye. Komîn avakirina jiyanê nû ya manewî ye jî. Ji ber vê, rêxistin û yekîneya esasî ya bingeha civakê û pergala Reveberiya Xweser komîn e. Ji ber vê, Komîn tê wateya nûnertiya vîna civakê. Ji bo vê, hemû endamên gund û taxan di komînan de pirsgerêkan xwe bi hev re nîqaş û çareser dikin û biryaran digrin. Yanî di komînê de demokrasîya raste rast çalak e. Em ji bir nekin, komînek ku nikaribe demokratîk bibe nikare polîtîk bibe, yê ku nikare polîtîk bibe nikare azad jî bibe. Her çiqas pergala dewletî bi hezaran salan zanebûn û heza fikirandinê ya însanan anîbe asta cemidandine jî, bi tevlibûneke çalak komîn dikare vê hêza civakî carekêdin bi însanan bide qezenckirin û xurt kirin.

Komîn qada jiyane ye ku civaka ehlaqî û polîtîk lê ava dibe û şekil digre, çand û jiyana civakî ava dibe û tê pêşxistin. Ya rast, şexs û hemwelatîyên azad encax di pergala jiyana komînal û demokratîk de dikarin pêşbikevin. Pergala dewletan xwe dispêrin desthilatdariyê, ti carî nahêlin ku şexs û civaka azad pêşbikeve. Lêdi komînan da însan dikare rih û hêza xwe keşif bike, xwe pêşbixe, xuliqkar be. Ev jî di gund û taxan de rê li pêşiya civakeke çalak, bi coş û kêfxweş vedike. Pêşketinekî wiha bê guman wê bandora xwe li ser bajarok, bajar û tevahiya welat jî bike.

Weke me gotî, jiyana komîn ne tenê astiyek aydê roja me ye ku em dixwazin nû pêkbînin. Bi milyonan sal mirovahî bi navê klan, komî jiyaye. Bi qasî tê zanîn, 20-15 hezarsalên dawî ehlaq û polîtîkayê li vê jiyana komîzêde kiriye. Di jiyana komînal de her tişt li gor pêwistiyan, bi awayeke wekhev tê parvekirin. Heq xwarin ti carî nayê bîra ti kesî. Çi tiştê ku ji xwe re bixwaze, destpêkê li civaka xwe difikire. Herkes baş dizane ku eger civaka wî-wê nebe, ew bi xwe ne tişteke e.

Di roja me ya îro de jî em lê binêrin; kesek ku demeke dirêj bi tenê bimîne, bi kesî re tişteke parve neke, bê heval û hogir be, bi cîranê xwe re jiyane parve neke an dîn dibe an jî nexweşiyên cuda pê re peyda dibin. Weke nimûne, kesek ku xwe bi hevalê xwe re acis kiriye, heya li hev neyin her tim ne rehet e. Însanên ku tenê bimînin ti carî kamil û kêfxweş nabin. Însan bi civaka xwe re, bi koma xwe re dibe însan.

Em car din li dîrokê vegehin, peydabûna desthilatdarî û dewletê bînin bîra xwe ku em baştir zanibin dewlet û desthilatdarî çendî zirar daye rêxistina civakê. Weke me gotî, însan bi dehhezaran sal bi komî jiyana kir. Komên xwêrnexwaz ya ji civakê qutbûyê bi dizî, bi zorê û bi bi fêlbazî hêdî hêdî berhemên civakê di destên xwe de kom dikin.

“Em bînin bîra xwe, heya serdema Sedam Hisên jî gelê me li gundên Çiyayê Şengalê komînal dijiyan. Dema bi navê komelgehan em bi darê zorê ji çiya daxistin û li deştê xistin bin serweriya xwe, êdî em mihtacî dewlet û desthilatdaran bûn”

Bi demê re civak tê wê astê ku ji tiştên ku afirandiyê xerîb bikeve. Weke mînak; bi hezaran sal loqman hekîm ji nav civakê derketin, civak bi xwe hem xwe bi derman kir hem jî nifşê nû fêrî hekîmtiyê kir. Kesî pere nedida da ku fêrî hekîmtiyê bibe û ti kes ji ber ku bê pere ye cane xwe ji dest neda. Rêveberî, hekîmtî, mamosteyî û hemû karên din ên civakî bi vî awayî bûn. Dema dewlet, yanî desthilatdarî pêşket, ew kesên zanaatkar, zana û hunermend birin qesrên desthilatdaran da ku tenê di bin hikmê desthilatdariyê de kar bikin.

Bi vî şeklî birîneke giran di civakê de peyda bû. Civakek ku nikaribe pêwistî û pirsgerêkên xwe bi xwe çareser bike, her dem mecbûrî hin cihan hate hiştin. Yê ku her dem mecbûrî hin kesan e, nîv-mirî tî hesibandin. Beriyar belasebep negotina “Çavê li deriyar, xwelî li seriyar.”

Em bînin bîra xwe, heya serdema Sedam Hisên jî gelê me li gundên Çiyayê Şengalê komînal dijiyan. Dema bi navê komelgehan em bi darê zorê ji çiya daxistin û li deştê xistin bin serweriya xwe, êdî em mihtacî dewlet û desthilatdaran bûn. Rêxistina me ya civakî derb xwar, îradeya me derb xwar, em anîn wê astê ku nema em karibin parastina xwe jî bikin. Eger tovê desthilatdariyê di nav civakê de nehatana reşandin, me yê hê jî pariya devê xwe bi hev re parve bikira. Wê derdê kesek, bibûya derdê me hemûyan. Wê jiyana evçend tehmsar nebûya. Belkî jî ji bo car din em bi tehma jiyaneke xweş û geş kevin, me divê em vegehin jiyana komînal.

Di heman demê de komîn, pergala herî rast a parastina gel e. Ji ber ku xwediyê jiyane ew bi xwe ye, hest û hişyariya wê ya li hemberî jiyana û ewlehiyê geş e. Eger civakek ji bo karên xwe, biryarên xwe bide wê hewldanê wê jî zêdetir bin. Hewldan jî hem mêjî hem rih dide şixulandin. Dema karê wê biserkeve, moral û manewiyata wê jî bilindtir dibe, eger tam bisernekeve jî difikire ka wê karê xwe çawa temam bike. Ev hemû di civakê de dil û mêjiyeke hişyar û zindî ava dike. Dema dil û mêji hişyar be, wê bi xeteriyar jî zû bihise û zûtir tedbîr bigire. Bi vî awayî wê êrîşan pûç bike. Ji ber van rastiyan, komîn hêza herî baş a parastinê ye.

Ji ber van rastiyan dewlet û desthilatdar ji jiyana komîn, îradebûn, zanebûn û rêxistina gel zehf ditirsin. Ji bo rêxistinbûna gel ava nebe jî, dewlet her dem ji civakê re gotiye “karên civakî tevlihev e, evî karî ji min re bihêle.” Yanî ji civakê re dibêjin hun nikarin xwe birêve bibin, emê hinek kes perwerde bikin da ku we birêve bibin. Dema dewlet van kesan perwerde dike jî, li ser fikrê xwe û ji bo bibin xulamê dewletê wan perwerde dike. Ew însanên ku ji aliyê dewletê ve tî perwerdekirin, êdî eleqeya wan bi rastiya civakê re namîne. Weke civaka Êzîdî, me ev rastiya xapînok dîtiye û fam kiriye. Ji ber vê ye ku heya fermana 2014’an jî me zarokên xwe zêde neşandine dibistanên dewletê. Lê kêmasiya me jî ew e ku, me zarokên xwe tam perwerde nekiriye.

Tam di vê noqtê de jî pêwistiya komînê car din derdikeve pêş. Komîn hem zarokên xwe perwerde dike hem jî ji desthilatdaran re nîşan dide ku civak dikare xwe perwerde bike û rêvebibe.

Di vê rewşê de dema civak xwe li ser esasê komînê birêxistin bike û perwerde bike, pêdivî bi dewletê namîne. Helbet desthilatdar ji vê rewşê acis dibin û dixwazin vê pergale tîk bibin. Dibe ku bi pêşkeşkirina madiyatê hewl bidin însanan ji komînê dûr bixin. Dibe ku bi avakirina hin rêxistinên cuda, weke munazame an jî meclîsên girêdayî dewletê, hewl bide rê nede sîstema komîn pêşbikeve. Lê em ji bîr nekin, dewlet dikare rêveberiyek ava bike, dikare qaşo meclîsên gel jî ava bike. Dikare bi çend kesên girêdayî dewletê meclîs ava bike, lê ev meclîs wê bibe tebeqeyek li jorî civakê. Wê ev meclîs ne biryarên gel, lê biryarên dewletê pêkbîne. Ev meclîsa girêdayî dewletê tax bi tax bi gel re civînan çênake, li gel guhdar nake û bi gel re biryaran nagire. Dewlet çî bêje, wê pêk bîne. Lê komîn ne wisa ye, tax bi tax, mal bi mal ji gel ava dibe. Bi xwe nîqaş dike, bi xwe biryar digire û bi xwe kar dike.

Ji ber vê ye em dibêjin; dewlet û desthilatdar dibe ku meclîs ava bikin lê ti carî komîn ava nakin, nikarin ava jî bikin. Ji ber vê ye em

dibêjin eger gel komînên xwe ava bike ti carî nabe bindest. Ti carî kes newêre êrîş wê bike. Bi komînan, wê gel bibe xwediyê jiyana xwe. Helbet ji bo jiyana bibe ya gel bi xwe; divê careke din hêza avakirina jiyana civakî, perwerdekirina zarokan, pêşxistina ehlaq û polîtîkayê dîsa çalak be. Em dizanin ku ji destpêka însaniyetê heya roja me ya îro jin-dayik her dem pêşengiya jiyane kiriye. Rêvebirên xwezayî yê destpêkê dayik û jin bûn.

Jin bi sedhezaran sal pêşengtî û rêveberiya xwezayî ji civakê re kiriye. Em niha jî nikarin bêjin ku bêyî hebûna jine wê rêveberiya civakî rast were kirin. Her çiqas desthilatdarî destpêkê şerê herî mezin bi jine re kiribe û her ku çûye rola wê ya jiyana civakî kêmkiribe jî, di roja me ya îro de em car din dibînin ku serwera malê dîsa dayik e. Em bifikirin, eger di malekê de dayik çend rojan nebe yan jî ew dayik nexweş be, ew mal wêran dibe. Îca dema ku jin di civakê de çalak nebe wê çawa ew civak wêran nebe. Ji ber van rastiyan di pergala komînan de ku bingeha civaka azad û demokratîk e; pêşengtî, aqil û hestên jine esas in. Ji ber vê ye ku, ji bo jin karibe rola xwe pêk bîne di komînan de pergala hevserokatiyê heye. Em baş dizanin ku eger di hemû qadên jiyane û kar de pêşengtiya wekhev a jin û mêr nebe, ne demokrasî ava dibe ne jî azadî tê bidestxistin. Ji ber vê hemû dinya niha dibêje “Jin, jiyana, azadî.”





Akademiya Jîneolojî

Di Ronansa Civaka Êzidî De Bi Jîneolojî (Zanista Jin) Ronansa Civaka Êzidî:

Di Ronansa Civaka Êzidî De Bi Jîneolojî (Zanista Jin) Ronansa Civaka Êzidî: Ronans, wek têgeh tê wateya ji nû ve vejînê û wek vegera xwezayê jî tê zanîn. Di zimanê Erebi de tê wateya rabûnê (Elnahda). Ronans ronîbûn û vegera li kokê ye. Rêber Apo dibêje; şoreşa zihniyetê ku li derdora Çiyayê Toros-Zagrosê de pêşket, civakîbûna li derdora dayîka xwedevand ava bû.

Amûrên hatin dîtin û bikaranîn, watedayîna jiyane nabe ji nedîtî ve were. Encax ev şoreşa ku di destpêka mirovahiye de bi pêşengtiya jinê çêbû, îro tê înkâr kirin. Ya tê înkâr kirin Ronans bi xwe ye. Tarîfa herî rast a ji bo ronansê ew e ku wek şoreşeke zihniyetê were bi nav kirin.

Rêber APO di Ronansa Rojhilata Navîn de roleke girîng dide ferdê azad, Ji bo wî-wê rizgar bike. Hewl dide bi ronansê yekîtiya xweza, civak û ferd çêbike. Bêyî ku ti kes xwe li ser yê din ferz bike. Di demek de ku şerê cîhanê yê sêyemîn berfireh dibe, pîrsgirêkên heyî milê civakî ji ekolojî, aborî, siyasî û parastinî bi zihniyeta bavîksalarî mezintir û kurtir dibe, banga Rêber Apo a aşî û civaka demokratîk bangeke dîrokî ye û manîfestoya serdemê ye.

Di heman demê de ji bo tevahiya mirovahiye, gelên bindest û hemû netewan, bi taybet ji bo jinan banga azadiyê ye. Ji bo avakirina jiyaneke wekhev, banga Rêbertî ji bo tevahiya Rojhilata Navîn û cîhanê neqşeya azadiyê îfade dike û despêkeke nû ya têkoşînê ye.

Rêber APO got banga aşî û civaka demokratîk, herî zêde ji bo Êzidiyan Ronans e û bersiva 73 fermanên Êzidiyan e. Di nameya dawî de jî got jin pêşengên esasî ya vê tekoşînê ne. Di vê wateyê de, ji bo rast fêmkirina banga Rêbertî û erk û berpirsiyariyên ku daye ser milê jin û civaka Êzidî pêwîstî pê heye ku em careke din vegerin ser heqîqeta kevna ya civaka me ku, bi hezaran salan e bi çand û baweriya xwe ya kevna ku di cewhera xwe de aşîxwazî û xwezaperestî ji mirovahiye re pêşengtî kiriye.

Ewqas dîrokeke kûr bedew û dewlemend e, bi yek peyvê hêjayî lêkolînê ye. Her wiha rastiya bi deh hezaran çîrokên keç, jin, zarokên Êzidî ku heya niha di destê DAIŞ'ê de dîlgirtî ne û çîroka bi dehan keç û jinên Êzidî ji bo nekevin destê dijmin xwe ji zinaran avêtin. Ev e heqîqeta Êzidiyatiyê di qêrîna jin û wan zarokan de li hemberî zilmê serî rakirine û hêjayî nivîsandina romana ye. Pêwîst e em ji xwe bipirsîn, fermanan bandoreke çawa li ser civaka me ava kir, gelo em çiqas dîroka xwe nas dikin, yan çandên cuda û sîstema heyî heya kîjan astê li ser kesayeta me bandor kiriye. Emê çawa bijîn, ji ku, çawa û kengî destpê bikin? Bi taybet wekî jinên Êzidî emê çawa bikaribin pêşengtiyê rast bikin? Emê çawa şoreşa zihniyetê ava bikin. Bervisa van û gelek pirsan di dahûrandinên Rêbertî de mirov bi zelalî dikare bibîne.

Formula Bi Sêhr A Jin, Jiyan û Azadî Rêber Apo dibêje; "Divê mirov jinê wek cins, nifş û çîneke ku ji mêj ve hatiye dîlkirin bigire dest û hindik be jî di warê sosyolîk de analîz bike. Lê weke nijad, çîn an jî netew

a herî zêde bindest. Divê baş bê zanîn ku ti nijad, çîn an jî netew weke jinê bi awayeke sîstematîk rastî koletiyê nehatiye. Jin bi tenê û bi tenê divê ya xwe be (xwebûn). Heta divê wer zanibe ku bêxwedî ye, bi tenê xwediyê wê, ew bi xwe ye. Eşq, hezkirina çavkorî jî di navê de, divê em bi ti awayî bi jinê ve neyên girêdan. Berovajiyê vê jî rast e. Di heman demê de divê jin jî xwe bi kesî ve girênde û kesî neke xwediyê xwe. Jina azad weke rojê hiltê. Peyvên Jin, Jiyan pîr watedar in. Divê jin bi qudret, azad û xwediyê biryarê be. Jin heyîneke binirx e. Ji ber vê peyvên jin û jiyana binirx in. Divê hûn fêrbûn û nûnertiya formula bi sêhr a Jin, Jiyan û Azadiyê bidomînin. Dîroka koletiya jinê hê jî nehatiye nivîsandin.

Dîroka azadiyê jî li bendê ye ku bê nivîsandin. Dîroka koletiya jinê bêguman di çanda Rojhilata Navîn de veşartî ye. Ji ber vê derketina wê jî dê li ser vê axê be. Lê eşkere ye ku ne bi tarzê mêr be. " Her wiha Rêbertî birdoziya azadiya jin, bi pênc rêgezan di sala 1998'an de pêşxist: Ruhê welatpareziyê, fikrê azad û îradeya azad, rêxistin kirin, tekoşîn, etîk û estetîk.

Di pareznameya pêncemîn de hevjiyana azad wê çawa pêk were, Rêbertî berfireh tarîf dike û dinirxîne. Mirov hewl bide pîrsgirêkên civakî çareser bike, divê mirov hûr û kûr li ser diyardeya jinê bifkire. Ji bo hewldana wekhevî û azadiyê jiyana jinê bike çavkanî û ev yek divê bi rêbaza lêkolînê û hem jî bingehe hewldanên zanistî, ehlaqî û estetîkê en hev girtî be. Rêbazeke lêkolînê ya ji rastiya jinê bêpar, tekoşîneke azadî û wekheviyê ya jinê nexa navenda lêkolîna xwe, nikare azadî û wekheviyê pêk bîne.



Bêguman, ji bo avakirina Ronensanê girîng e bi zihniyeta dayîksalarî, bi zanista jin ango Jineolojî ku bingehê hemû zanistan e were pêşxistin. Bi ferasetên teng, doxmatîk ango bi zihniyeta zayendperest ku di encama wê de her kêlî şideta fîzîkî û derûnî pêk tê, guhertin û veguhertin ne mumkin e. Li cihek ku qirkirina jinan ji kuştin, xwekuştin bigire, heya pirjinî û berdana zêde hemû cureyên şidetê were jiyan kirin, gelo emê çawa behsa azadiyê bikin? Ev pirseke heyatî ye ku her yek ji me pêwîst e ji xwe bipirse û bersiva wê bide.

Di fikrê Rêbertî de jin hêzeke bingehîn e ku dikarin civaka azad, demokratîk û xweser biafirînin. Li Şingalê jî di xebatên xweparastinê û xweseriyê de hêza jin xuya dike. Ji bo Ronensanê nû ya jinan, di nav civakê de li Kurdistan û bi taybetî li Şingalê pêk were, pêwîst e pergalek zanistî, perwerdehî û xwebûnî ya civakî bi nêrîna Jineolojîk ku bingehê tevahî zanistan e, were afirandin. Ji ber vê xwe perwerde kirin, civak rast perwerde kirin, bi taybet girîngî dayîna perwerdekirina mêran, wê pêşî li pirsgirêkên civakî bigre û rêbazên çareseriyê li ser bingehê demokratîk pêş bixe. Wê bibe sedema rêxistinbûneke berfirehtir û kûrtir were ava kirin ku civakek polîtîk û azad ava bibe.

Bi rêxistinbûnê hêz, enerjî û îradeya jin a kolektîf wê derbikeve asta herî bilind, wê jin bibe xwedî maf û nasnameya azad. Bêguman azadî bi hêsanî bi pêş nakeve, bi têkoşîn û berxwedaneke mezintir pêkan e. Her zanista, fikra ku nû pêş dikeve ruhê demê dide teyisandin. Jineolojî weke zanistekî ku di sedsala 21'emîn de pêşketiye,



ruhê şoreşa jinan ku di vê sedsalê de gav bi gav, bi êş û berdelên mezin, bi têkoşîn û berxwedanên giranbûha pêşdikeve diteyisîne. Hem ewê ji pirsgirêkên civakî re bibe çareserî, hem jî berê xwe bide dîroka hezaran salan a jinan a wenda. Zanebûnên jinan, ilmê jinan, dîroka azadiya jinan ku ji dîrokê hatiye mesihandin, careke din derxîne ser rûyê erdê û bi qûdreta vê zanebûnê, di Ronensanê civakan de bibe fikr, felsefe û ilmê jinên pêşeng.

Jineolojî di demêkê wisa de ji aliyê Rêber Apo ve ji bo jinan hate pêşniyar kirin ku, di cîhanê de zayendperestî ji her alî ve dixwest hebûn û tekoşîna azadiya jinan ji holê rabike. Rêber Apo bi îsrar dibêje; "Jineolojî dikare bibe derketinekî bingehîn." Beriya her tiştî di civaka me de û di giştî cîhanê de

Jineolojî hewl dide; ew jiyana civakan ku xitimiyê, di bin destê desthilatdariya mêr de hildiweşe çawa were guhertin, rê û rêbazên vê peyda bike. Ango hedef dike ku, hemû tiştên ku heqîqetê diêşîne, texrîb dike û ji koka xwe dûr dixîne paqij bike û careke din li ser koka wê kesk bike. Bi nirx û wateyên ku nasnameya jin di xwe de dihewîne, em dikarin ne tenê xwe, cîhanê û mirovahiyê rizgar bikin. Jineolojî dibe zanista vê tekoşînê, bilêvbûna enerjî û wateya jinê û heqîqetbûna wê ye.

Di dîrokê de em weke civaka Êzidî, rastî 74 fermanan hatine, di heman demê de em civakek xwedî çanda berxwedanê ne, bi gotineke din me ser daye lê me sira xwe nedaye. Bi sedan çîrokên berxwedan û lehengiyê yên jinan hatine jiyan kirin.



“Di dîrokê de em weke civaka Êzidî, rastî 74 fermanan hatine, di heman demê de em civakek xwedî çanda berxwedanê ne, bi gotineke din me ser daye lê me sira xwe nedaye. Bi sedan çîrokên berxwedan û lehengiyê yên jinan hatine jiyayî kirin”

Duh Zarife Osê, Stiya Nisra, Meyan Xatûn, Stiya Neqşa îro jî Dayê Gûlê, Cîlan, Zêrê, Nazê, Bêrîvan û Arînan. Duh Şêx Mîrzayê Elqûsî, Êzidî Mîrza, Mihemeyê Evdo û Derwêşê Evdî. Îro jî Zerdest, Dijwar, Çeko, Seîdan û bi sedan leheng û Egîdan, keç û xortên Êzidî serê xwe di riya TAWÎSÎ MELEK de dan û navên xwe bi tîpên zêrîn di dîroka azadiyê de nivîsandin. Her wiha Rêheval Mam Zekî stûn û remzê yekîtî û tifaqa Êzidiyan e. Ronasans ji bo tevahiya civaka Êzidî ya li welat û derveyê welat girîng û derbasdar e.

Bê yekîtî û tifaqa civaka Êzidî û bê vegera ser war û koka xwe, ne mumkin e ronasans bê pêşxistin. Em dikarin bêjin ku civakên herî zêde ferman jiyayî kirine dikarin wate û girîngiya avakirina ronasansê fêhm bikin û pêk bînin. Di vê wateyê de em wek jin û civaka Êzidî dikarin ji bo Rojhilata Navîn pêşengiyêke bi hêz bikin. Emê bi

hev re bi felsefa Rêber Apo a jin-jiyayî azadî ronasanseke nû a jinan bi destê jinan biafirînin û civaka demokratîk pêş ve bibin. Nameya Rêbertî ji bo Jîneolojiyê Min ji zarokatiya xwe ve hewl da ku ez bibim heval û rêhevalê jinê yê herî baş. Di têkiliya min û dayîka min de jî, lêgerîna min a ji bo jina azad dikare were dîtîn. Ez girêdayî xeyalên xwe yên zarokatiyê mam, bi wî rengî min jiyayî kir û têkoşîna azadiya jinê derxist holê.

Dema ez nû anîm Girava Îmraliyê min gotibû; “Xebata min a derbarê jinê de projeyêke ku nîvçe maye.” Ev xebata min êdî tamam bûye û tiştê dimîne pêkanîna wê ye. Têkoşîna azadiya jinê mîrateyêke gelekî girîng afirandiyê. Ev mîrate bi dayîna bi hezaran şehîdan heta roja îro hat û nirxekî girîng ava kir.

Pêwîst e bê zanîn ku min her tim xwest jin bijîn û ew bînin jiyandin. Her windahiyek wan her tim ez eşandime. Ji bo min gotin, “Ew kurê xwedawendê ye.” Min jî xwest ez bibim kurekî (zarokekî) hêjayî jinan. Vê yekê rêgeza bingehîn a têkoşîna min diyar kiriye. Min ji bo jinan, “Rêgeza hêviyê” bi pêş xist. Min got, “Pêwîst e her jinek azad bibe.” Wekî mêrekî min jî bi pîvanên etîk û estetîk ên li gorî azadiyê şêkil girtine, xwe terbiye kir. Min got, “Rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê azadiya jinê ye.”

Pîvana mêrekî ya sosyalîstbûnê jî ew e ku zanibe li gel jinê bi awayekî rast bijî. Ev rêgeza bingehîn a sosyalîzmê ye. Di tecrubeyên sosyalîst ên di tevahiya dîrokê hatine jiyayî kirin de ev rêgez her tim kêmtir maye. Ji Marks heta Stalîn, ji Mao heta Lenîn, eger pêwendiya tevahiya rêberên pêşeng a bi jinan re were lêkolîn kirin,

wê ev heqîqet hîn baştir were fêhm kirin. Projeya min a nîvçe maye, bi Jîneolojiyê re jî meşiya. Min xwest bi vê teorî û têgehê pirsgirêka jinê rast pênase bikim. Wekî ku Budha gotiye; “Heta ku tu xençera di piştê civakê de dernexînî, tu nikarî qet tiştêkî bikî.” Belê, gelek pirsgirêkên civakê hene, lê xençera di piştê de koletiya jinê ye û heta ku tu vê xençerê dernexînî, tu nikarî ti pirsgirêkan çareser bikî. Jîneolojiyê bi vê mebestê rêyêke girîng derbas kiriye. Kedeke bi nîrx hatiye dayîn. Niha pêwîst e ev ked, bi pêvajoya nû re hîn zêdetir wateyê qezenç bike. Pêwîst e hebûna jinê rast were pênase kirin û nasname û hebûna jinê bi rêbaza wekhevîbûnê bê nîrxandin.

Sîmon dibêje ya; “Wekî jin nayê dinê, dibe jin.” Pêwîst e nasnameya jinê ya ku hatiya ava kirin ji hêmanên zayendîperest were paqij kirin. Divê jin ji bo vê yekê lêhûrbûn bikin. Eynî wekî ku V. Woolf gotiye; divê odeyek aydê jinê bixwe hebe. Pêwîst e derbarê xwe de bifikire û karibe xwe ava bike. Ez dizanim jinbûn çiqas zehmet e û bi vê zanebûnê viya dibêjim. Dema di bin çanda tecawîzê ya zîlam de jiyayî dike, bi awayekî azad xwe ava kirin, ji bo jinê zehmet e. Lê jin vê rastiya şewitîner qasî min bi êş kişandinê, bi hêrsbûnê hîs dîkin yan na, ez nizanim. Ez bi vê hêrsbûnê her roj bi awayekî fikrî xwe nû dikim, çareseriyê hildiberînim û ji bo ku jin bi awayekî azad bijî, dijîm. Wateya jiyayî li cem min bi vî rengî rasteqîniyê qezenç dike.

Tê gotin ku femînîst dibêjin çima mêrek pêşengiyê tevgera jin a Kurd dike. Mafdar in, xweziya jinan karîbûya vê pêşengiyê bikira. Min jî ev gelekî dixwest. Mixabin li derveyê tevgera Kurd jî, bi giştî jî hîn ev pêşengtî derneketiyê holê. Min her tim

got, divê jina azad çawa be û ji bo wê proje, teorî çêkirin; min bîrdoziya azadiya jinê û Jîneolojiyê pêş xist, min ev gihand hêza rêxistinbûnê. Min ji bo veguherandina mêr û bi rêya jinê azadkirina civakê hewldan kir, xebat meşand. Ji bo ku bibim zarokekî hêjayî xwedawendan, min ev yek kiriye. Ez bendewar im ku min bi vê rastiya min, bi awayekî rast bidin fêhm kirin.

Ez dizanim ku wê jin pêşengiyê pêvajoya “Aştî û demokrasiyê” ya ku em hewl didin pêş bixin, bikin. Ew xwediyên ji nîvê zêdetirî serkeftinê ku heta niha hatine bidestxistin in. Bawer dikim ku wê ji niha û pê ve jî pêşengiyê bikin û dibêjim ku ji niha û pê ve jî, ez ê her tim bi qasî ku hûn pêdivî dibînin bi we re bijîm û bi we re bim.

Rêber APO





KORDA MAD EZÎZÊ CEWO

ŞENGALA PÎROZ

Ez bi derdê Gelîyê Zîlan kewgirîm,
 Ji bo gorîyên Agirî ez nalîyam,
 Ez ji bo derdê Koçgirî zaryam,
 Ê ji bo derdê Dêrsima kevnar
 Ê Çarçirayê dilê min êşya,
 Ê derdê Amûd û Qamûşlokê,
 Ê kula ewan zar'ên Helebçê...
 Ê kula giran hevtê û sê ferman
 Fermanên li ser Şengala pîroz!
 Ma tenê ev bûn, lê ji bilî vana?!
 Hevtê û çend ferman anîn serê me?! ...
 Ez kîjan derdî îro nav bikim
 Ez kîjan kulê bînim ber çavan!
 Welat seranser bû derya xwînê...
 Ê dîsa hatin ser Axa Pîroz
 Mîna seyên har, gurên beratê!..
 Şengala kevnar, çendik çend caran
 Pakrewan bûyî, lê dîsa mîna
 Gula bihuştê, car din şîn bûyî!..
 Ê dema îro dîsa hewar e,
 Ê dema îro dîsa ferman e,
 Hîç kes nikare, me biparêze,
 Ger em nebin yek nebin hêzekê
 Ji bo xatirê Dayka Nîştîman,
 Ji bo xatirê pakrewanên xwe,
 Ji bo rizgarîya gelê zêryayî...

Ku Kurdistan jî li rû cîhanê
 Serbest û azad bijî, gulvede!
 Ku em jî weke gelên cîhanê
 Bi hemû rengên Kurdistanî va
 Wek xelkên dinê serbilind bijîn!
 An na, wê car din fermanê bidin,
 Dîsa êrîşan wê bînin ser me
 Êrîşên barbar ewên hov û har!
 Ê emê dîsa bêne zêrandin,
 Ê dîsa xwîna meyê birije,
 Ê dîsa emê bibin penaber
 Hêsîr, segedan li serê rêyan bin,
 Bin pêyê dijmin da bibine gorî
 Ê wînda bibin bê wate û armanc!
 Gelo ne bes e!
 Ê heya kengê!
 Bersîva evê pirsê kîyê bide?
 Her emê bi xwe bibine bersîv
 Bi helwesta xwe,
 Bi biryara xwe,
 Bi yekîtîya xwe
 Ê bi cenga xwe
 Cenga rizgarîyê!

Tu bawer be, Şengala Pîroz,
 Îro fermana te tenê nîne,
 Ewa fermana netewa Kurd e!
 Kurd û Kurdistan îro bûye yek,
 Kurd û Kurdistan rabûye ser pêyan,
 Ê rizgarîya te wê bixwe bîne,
 Azadîya xwe jî wê bigihîne...
 Ê tuyê bibî ewê cîgehê,
 Li ku yekîtîya me digihîje
 Yekîtîya hemûyan ya netewekê,
 Şengala Pîroz
 Xaka me rengîn...

ناستهنگ. د هه‌مان دهمی دا سالین ۷۰ی، سالین کو سیاسه‌تین پشتگوهفه هافیتنی و ئینکارکرنی بوو، سالین ژناقبرن و پشاقتنی بوو کو ژلایئ دهولتا ترک فه، ب دژواری ل سهر گه‌لی کورد دهاته بریقه برن. هه‌یامه‌ک بوو ل سهر جفاکی گفاشتن و چه‌وساندنه‌کا توند و دژوار هه‌بوو. بایی گه‌نجین شوهرشگر، گه‌نجین کورد ژی خسته ناقفا فی قه‌لقین و ته‌فگه‌ری، د وان سالان دا بی هیقیوون ژبو کوردان بهر ب هیقی و ئومیدان هاتبو گوهارتن و سهر ژنوی هشیاریونه‌کا جفاکی دهست پی کر، مام زه‌کی ژی هیدی هیدی ده‌ته بهر بایی گه‌نجین شوهرشگر.



دهولتی ژبو پاراستنا ئیزدیان چ بهرپرسیارییه‌ک وهرنه‌گرتبوو، لی ب ئه‌رککنا چونا له‌شکرین ل سهر پشقا هه‌ر گه‌نجه‌کی ئیزدی، ئه‌رکی پاراستنا دهولتی هاتبوو فه‌رکرن! مام زه‌کی ژی ژبو کو ب زویترین دم لژیر فی باری ده‌رکه‌فیت، چوبو له‌شکرین. په‌روه‌ردا له‌شکریا خوه ل مانیسایی بدوماهی ئینا، د قوناغا دابه‌شبوونا له‌شکر ی دا ژی ئه‌رکی وی که‌ته باژیرئ ئسته‌نبولی و ئه‌ف به‌لایا له‌شکرین ل ئسته‌نبولی بدوماهی ئینابوو. ل دهمی قوناغا له‌شکرین دا وی ناکوکیا کورد و ترکان ب زه‌لالی ب چاچی خوه دیت بوو و دگه‌لدا ژیان کربوو. مام زه‌کی، د راپورته‌کا خوه یا ساللا ۲۰۱۰ دا کو پیشکه‌شی سکرتراریا (پ. ک. ک) کری، ئه‌ف ناکوکی بقی ره‌نگی قه‌گیرابوو:

«دهمی ئه‌ز ل له‌شکرین بووم، ل باره‌گای به‌رده‌وام دناقبه‌را کورد و ترکان دا شه‌ر و ناکوکی ده‌رکه‌فتن. ل وی باره‌گایی کو ئه‌ز تیدا بووم، هنده‌ک سه‌ربازین پاشستی هه‌بوون. وان خواندنا زانینگه‌هی بدوماهی ئینابوون و تیکه‌لیا وان دگه‌ل ته‌فگه‌را ده‌نیز گه‌زمیش هه‌بوو. له‌ورا، په‌لیا وان ئینابوونه خاری و بی په‌ هیلابون و هه‌ر وه‌کی سه‌ربازه‌کی ئاسایی له‌شکریا خوه بریقه‌دبرن. ئه‌و که‌ساتین سؤسیالیست و وه‌لاتپاریز بوون کو مه‌ ب پیشه‌نگیا وان گروه‌کا پیک هاتی ژ بیست که‌سان ئاقا کربو. له‌ورا دم ب دم د ناقبه‌را کوما مه‌ و کومین فاشیستان دا شه‌ر و ناکوکی ده‌رکه‌فتن. هه‌ر ل وان ده‌مان دا هشمه‌ندیا کوردایه‌تی د ناقفا ناخی من دا گه‌ش بوو. دهمی ئه‌ز ل باتمانی بووم، تیکلیین من دگه‌ل هنده‌ک مالباتین ژ عه‌شیرا پامان هه‌بون، عه‌شیرا پامان ل ده‌وروبه‌ران وه‌کی عه‌شیره‌کا وه‌لاتپاریز ده‌اته ناسین»

وی دهمی خزمه‌تا له‌شکر ی ۲ سال بوون. مام زه‌کی، پشتی ۲ سالان، ل ساللا ۱۹۷۴، قه‌دگه‌رپته گوندی خوه و پشتی دهمه‌کی قه‌دگه‌رپته ئه‌لمانیا ده‌ف مالباتا خوه. مام زه‌کی، چ جاران په‌یوه‌ندیین خوه دگه‌ل واری خوه یی کو لی ژدایک ببو، قوت نه‌کربوو. هه‌ر سال، هافینان، دچوو وی ناخا لی ژدایک بویی و ماوه‌کی ل گوندی دما و دیسا ژبو کاری خوه قه‌دگه‌ریا ئه‌لمانیا. پشتی دهمه‌کی ژ بلی دایکا مام زه‌کی، هه‌می ئه‌ندامین مالی چوونه ئه‌لمانیا. سالین کو گه‌نجین شوهرشگر ل ترکیا و کوردستانی سه‌ره‌لدابون و ببونه هیفیا گه‌لان. نفشی سه‌رده‌ما سالین ۶۸، ته‌فگه‌ریین گه‌نجین شوهرشگر بوون کو کارتیکرن ل هه‌می جیهانی کربوون، ئه‌ف کارتیکرنه ژی پیلین وی گه‌شتبونه گه‌نجین ترکیا و کوردستانی ژی. د وان سالان دا خه‌تا شوهرشگری و دژی شوهره‌شی وه‌کی شویره‌کی تیژ جفاک کربوو دوو به‌ش. سه‌ره‌رای کو ته‌فگه‌را گه‌نجین شوهرشگر د ناقفا جفاکی دا جهی خوه مکوم کربو، دهولتا ترک و فاشیزما جفاکا سقیل یا ترک و دربین له‌شکر ی، وه‌کی به‌نداغه‌کی ل هه‌مبه‌ر گه‌نجین شوهرشگر دبوو

گولو ئینابوو شمزی. مام زه‌کی، د گولانا ساللا ۱۹۷۰ دا، دوو مه‌هان پشتی شه‌هیانا خوه، دگه‌ل هه‌فژینا خوه گولوئ، قه‌گه‌ریا ئه‌لمانیا. مام زه‌کی، د وی کومپانیا کو لی کار دکر به‌رده‌وامی دا کاری خوه. ئه‌و ژی وه‌کی د هه‌ر قاده‌کا ژیانی دا خه‌باتکاره‌کی زیره‌ک و د کاری خوه دا هه‌رده‌م پژد بوو. که‌سه‌کی وسابوو کو هه‌قالین وی یین کاری و هه‌م ژی به‌رپرسیین وی یین کاری ژی باوهر و پشتراست ببون. ئه‌و ده‌اته هه‌زکرن و باوهری ددا ده‌وروبه‌ریین خوه. له‌ورا، به‌رپرسی وی یی کریکاری مووچی وی هندی دی زیده کربوو. وی به‌رپرسی باغه‌کی فیقیان هه‌بوو کو هه‌رجار ل دومه‌یا هه‌فتی مام زه‌کی دگه‌ل خوه دبره‌ ناف باخچی خوه و ری ددایی ژبو خوه فیقی به‌ته.

زاروکی وان یی ئیک کوره‌ک بوو کو ل ۲۰ی حوزه‌یرانا ساللا ۱۹۷۱ ژدایک ببوو، ناقی وی کربو قاسم. مام زه‌کی ل حوزه‌یرانا ساللا ۱۹۷۲، ب ته‌مامی ساله‌ک پشتی ژدایکبوونا قاسم، چوبو له‌شکرین. ۳ مه‌هان پشتی چونا مام زه‌کی بو له‌شکرین، ل مه‌ها ئیلونی، کور ی وی دووی، ئه‌سکه‌نده‌ر ژ دایک دیت. ل به‌رامبه‌ر ئیزدیان دهولتی چ ئه‌رک و به‌رپرسیاریه‌ک نه‌دگرت هه‌ر ملی خوه ژ بلی فه‌رمان و کومکوژی و کۆچه‌رکنا وان یا ب داری زورئ. لی ئیزدی به‌رده‌وام ل به‌رامبه‌ر دهولتی، خوه‌دی به‌رپرسیاری بوون و ئه‌ف ئیک ژی نه‌چاری بوو. د ناف فان نه‌چاری و ئه‌رکان دا، باج و سه‌رانه‌دان و چونا له‌شکرین ژی هه‌بوو. خه‌راج و سه‌رانه‌یین کو ئیزدیان ددانه دهولتی، وه‌کی قه‌ره‌قول دیسان بو سهر ئیزدیان قه‌دگه‌ریا. خزمه‌تا هه‌ره‌ بنگه‌هین کو دهولتی ژبو ئیزدیان کری ئه‌فه بوو.

” ل به‌رامبه‌ر ئیزدیان دهولتی چ ئه‌رک و به‌رپرسیاریه‌ک نه‌دگرت هه‌ر ملی خوه ژ بلی فه‌رمان و کومکوژی و کۆچه‌رکنا وان یا ب داری زورئ “

ئه‌سکه‌نده‌ری کور ی مام زه‌کی:

«دو ئه‌گه‌ریین کۆچه‌ری هه‌بوون؛ یا ئیک ئولی بوو، یا دووی ئابوری بوو. وان ئازادیا ئولی نه‌بوو. هه‌م ژی وان نه‌دکاریین ب ئارامی ب مه‌رما کار و ده‌باری به‌ر ب باتمانی و ده‌وروبه‌ری وی قه‌ بچن. ژ خوه قه‌ت نه‌ پیکان بوو بچنه‌ جزیرئ. ئه‌گه‌ر زانیان ئه‌و ئیزدی نه، مه‌ترسیه‌کا مه‌زن ل سهر ژیانا وان چی دبوو. هه‌تا سالین هه‌شتییا و ده‌ستپیکرنا شوهره‌شی ره‌وش به‌رده‌وام ب فی ره‌نگی بوو.» ب گوتنا ریبه‌ر ئاپو ل خا‌کا نان، بی نان مابوون. «له‌ورا ژبو ئیزدیان ئه‌ورویا، ب تاییه‌تی ژی ئه‌لمانیا، وه‌کی ده‌رگه‌هی هیقی ده‌اته دیتن.

دهولتا ترک ژی ژ بوکو ئیزدی ده‌ست ژ واری خوه به‌رده‌ن، ری ل به‌ر وان قه‌کری ده‌یلا. ئیزدیان ئیک ب ئیک ده‌ست ژ واری خوه به‌رردان و ژبو کو نانی رۆژا خوه ب ده‌ستقه‌ بینن، رییا ئه‌ورویا گرتبوونه به‌رخوه. مام زه‌کی ژی د ته‌مه‌نه‌کی بچوک یی ۱۷ سالی دا، به‌ری خوه دابوو فی رییا غه‌رییی. دهمی کو کۆچه‌ریا به‌ر ب ئه‌ورویا ده‌ست پی کربوو، ئیزدی پرانی ل باژیرئ جه‌له، یی ئه‌لمانیا ئانجی ببون. که‌کی مام زه‌کی، سلیمان ژی چبوو جه‌له‌یی. سلیمان، پشتی ساله‌کی کارکرنی خاست براییین خوه ژی بیته‌ گه‌ل خوه. مام زه‌کی و که‌کی وی، پشتی کو کار و بارین خوه یین فه‌رمی پیک ئینان، به‌ری خوه دابوونه رییا به‌ره‌ف ئه‌ورویا. وی دهمی ریویتیا هه‌ره‌ ئه‌رزان ب تره‌نی بوو و هه‌ر ب تره‌نی ژی چوبونه ئه‌لمانیا. ئه‌و هیشتا ۱۷ سالی بوو دهمی ل ساللا ۱۹۶۹ چویه ئه‌لمانیا.

د دهمه‌کی کیم دا ل کومپانیا‌یه‌کی که‌تبو سهر کاری. گره‌نتیا وی یا کارکرنی نه‌بوو، هه‌ر وه‌ک هه‌می کریکاریین دی یین قاچاخ، ئه‌و ژی وه‌کی “کریکاریین کوله” کار پی ده‌اته کرن، لی ب کارکرن ل قوناغا ۲ سالان هنده‌ک پاره‌ کومی سه‌ر ئیک کربون. مام زه‌کی بییا گوندی خوه و مالباتا خوه کربوو، د دلی خوه دا هه‌سه‌رته‌ قه‌گه‌رینا گوند و جهی ژدایکبوونا خوه گه‌ش و مه‌زن کربوو. ل ساللا ۱۹۷۰ پشتی ناقبه‌را دوو سالان مام زه‌کی شیا قه‌گه‌رپته گوندی خوه، وی ژی وه‌کی هه‌ر ئیزدی‌ه‌کی دگه‌ل که‌سه‌کا ژ چینا خوه هه‌فژینی پیک ئینابوو. “هه‌د و سه‌د” د ئیزدیاتی دا ل هه‌ر جه‌ه‌کی وه‌ک پیفانه‌کی بوو. ئیزدیان تنی دکاریین ب چینا شیخ دگه‌ل شیخ، پیر دگه‌ل پیر، مرید د دگه‌ل مریدان ژیانا هه‌فژینی پیک بینن. ژ بلی فی ژیانا هه‌فژینی قه‌ده‌غه بوو و سزای وی ژی گران بوو. مام زه‌کی، ل نه‌ورۆزا ساللا ۱۹۷۰ پشتی به‌تالانه‌یی چوبو گوندی خوه. ل گوندی جیران یی شاه‌سمی، دگه‌ل گولوئی ژیانا هه‌فژینی پیک ئینابوو. جه‌ژنا نه‌ورۆزی بوو، وی دهمی ژ به‌ر کو دناقفا گوندی دا که‌سه‌ک هاتبوو کوشتن، شه‌هیان نه‌کربون. بی شه‌هیان

ژی گهلهک جارن ژلایی فاشیستین ئیسلامیست، ب تایبته ژلایی فاشیزما دهولتهتی فه، ب فهتوایا "خودئ نهناسی، کافر بوون و بی کتیب بوونی" هاتنه کومکوژ کرن. لهورا ههول هاته دان کو هشمهندی و تیگهها دهولتهتا ئیکگرتی ل کومارا ترکیی زال بییت. سالین ۱۹۵۰ سالین کو گهل ژلایی شوڤینیزما ترک فه هاتیوونه سه رکوتکرن. ئاستا هشمهندیا کوردپهروهری و کوردستانی بوونی داکهتبوو. هشمهندیا کوردیایهتی د ناڤا ئیزدیان دا هه ما بیژه ب گشتی نه مابوو. ل گهل پۆلیتیکاییین نکولی کرن و ژناقبرنی یا دهولتهتا ترک، بویه رین دیرۆکی و ئولی ژی له زاتیهکا زیدهتر دابوو قی پیڤاژوی. مام زهکی، د رهوشهکا ب قی رهنگی دا ژ دایک بیوو. مام زهکی، هیژتا د ته مهنی ه سالین دا بوو بابی خوه ژدهست دابوو. وی گهلهک ژ بابی خوه ههز دکر، ئه و بخوه ژی گهلهک خوشتقیی بابی خوه بوو. دهمی فرمانی بابی وی وهفات دکته، مام زهکی د هه میژا وی دا پارایی بوو و های ژئ نه بوو کو بابی وی مریه. دهمی فرمانی بابی وی وهفات کری، گرانی ته قاهیا بارئ مالباتا هه ژار دکه قیته سه رملی دایکا گولۆ. مالباتا زهکی شنکالی ژی وهک هه می مالباتین دی یین ئیزدی گهلهک هه ژار بوون، خه زال، خویشکا مام زهکی، ب قان گوئین هه ستیار به حسی مرنا برایی خوه دکته:

”گوتههکا لگوری ئولی مه هه یه دبیزیت؛ ل سهری خودئ، پشتی وئ تاوسی مه لهک و دیقدا ژی زهکی هه ره شرینی مالی بوو“

«هه قالی زهکی! زهکی شیرین، خوهزی دهمی من به حسی وی دکر، دلئ من نه شهوتیبا ژبو کو من کاریبا ب دلهکی ئارام به حسی وی کربا. برایهکی گهلهک شرین و ژیهاتی بوو. د ناڤ مالی دا نرخ و و بهایی وی دهاته زانین. گوتههکا لگوری ئولی مه هه یه دبیزیت؛ ل سهری خودئ، پشتی وئ تاوسی مه لهک و دیقدا ژی زهکی هه ره شرینی مالی بوو. ئه م ه برا و ۳ خوشک بوین. هه مزه، عوسمان، براهیم، سلیمان، گولئ، په ریشان، ئه ز و زهکیی بچووک. ئه ز وان ده مان ژ بیر ناکم. ب بگشتی ئه ز و زهکی ل جههکی پیگه دنقستین. مه هه ردهم هه نهک و یاری دکرن.

هه ر تشت ل بهر چاقئ مه مینا بهه شتی بوو. ئه م گهلهک دگهل ئیکو دوو دلخوهش بووین. جهی کو ئه و لی با، ئه م ژئ تیر نه دبویین و قهت ژئ دلگران نه دبویین. وی دهمی ئه م جارنا هه تا درهنگی شه قئ ل دؤرا ئاگری د رونهشتین. بابی من چیرۆک ژبو مه دگوتن. شه قهکی ل دهمی خه وئ، بابی من دهستی زهکی گرت بوو و بربوو گهل خوه و پیگه پارابون، هه ر د بهرخه ودا ژئ بابی من دلئ وی راوستیابوو، ئه وی نه خویشیا دلئ هه بوو. دهمی مرنا وی، زهکی د هه میژا وی دا بوو. زهکی، دگهل بابی من دنقست، وی دهمی ته مهنی وی ب تنئ ه سال بوو.»

مام زهکی، ژ بهر کو هیشتا ژ زارۆکتیی بیو که ساتیهکی ب ریکوپیک، هه م دناڤا مالباتی و هه م ژئ دناڤا گوندی دا ژ لایی هه ر که سهکی فه دهاته هه زکرن. ژ بهر کو د پینج سالی خوه دا بابی خوه ژدهست دابوو، ژ بچووکتیا خوه دا هه ستین بهرپرسیاری و خودانکرنا مالباتی دگهل دا ئاڤا بوو. وی د ته مهنی ۶ سالی خوه دا دهست ب خواندنا دبستانی کربوو. ب زیرهکی و ژیربوونا خوه سه رنجا مامۆستاییین خوه بهرف خوه فه کیشا. بهری ب دوماهی ئینانا پؤلا ئیکئ، مامۆستای مام زهکی فه گوهازت بوو قوناغا پؤلا دووئ. مام زهکی ب پله یا ئیکئ خواندنا خاندنگه هئ بدوماهیک دئینیت. ل گوندئ کو مام زهکی لی هاتیه دنایی، دبستان نه بوون. لهورا قوناغا دویراتی دوو کیلومه تران دچوو خاندنگه ها سه رهتایی یا گوندئ شاهسمئ کو گوندهکی ئیزدیان بوو. ل زفستانی ل ژیر بهفر و سه رمائ و ل بهاری لژیر باران و هه ریی رییا هاتن و چوئین مالی و خاندنگه هئ دپیڤا. مام زهکی ل کیلهکا خواندنا خاندنگه هئ ب کاری چاندنا رهز و زهقی و باخچه یان هه ول ددا هاریکاریا دهبارا مالباتا خوه ژئ بکته. وان چه ند په ز و بزنهک هه بوون کو جارنا ژئ وی بز ن دچه راندن. وی گهلهک هه ز ژ په یوه ندییین دگهل خوه زایی دکر. هه که د ناڤه را زارۆکان دا شه ر دهرکه قتبا وی ئیکسه ر ناڤه رینکاری دکر و بهرامبه ر که سه ئه مافدار هشیاری ددا و ری نه ددا سلبون چی بییت. هه ر ئه ق جوړئ که ساتیا ئاشتیانه یا مام زهکی بوو کو د ده مین ته مهنی دویرتر یا د ناڤا ته قهه را ئازادیی دا بهیزتر دبیت، هه م ژئ د ناڤا پیگهاته یا جفاکی یا ئیزدیان، رۆلهکی گرنگ دگتیریت. خه زال، خویشکا مام زهکی، سالین خوه یین خواندنی ب قی رهنگی فه دگتیریت:

«مه دهست ب خواندنا خاندنگه هئ کربوو، دهمی ئه ز دچومه پؤلا سیین، زهکی دهست ب پؤلا ئیکئ کربوو. رییا خاندنگه هئ ستری بوون. ئه ز ژئ نه هند ب ته مهن بووم، لی دیسا ژئ هه ر جهی ستری لی هه بوون، من زهکی دکره پشتا خوه، دا کو ستری نه چنه د پین وی دا. مه ب قی رهنگی ژئ هه ز دکر. ئه و گهلهکی شرین بوو و شرین بوونا

خوه سه لماندبوو. من پؤلا پینجی ب دوماهی ئینا، زهکی ژئ بهردهوامی پی ددا. مامۆستایهکی مه هه بوو کو برایی وی دگهل زهکی هه قالیی دکر. د ناڤه را هه می خویندکاریین خاندنگه هئ، ژ هه مویا زیدهتر مامۆستای هه ز ژ زهکی دکر. مامۆستای هه رچی تشتی ژبو برایی خوه کریبا ژبو زهکی ژئ دکرئ.

دهمی مام زهکی خاندنگه ها سه رهتایی بدوماهی ئینای سال ۱۹۶۳ بوو. ل گوندی خاندنگه ها ناڤه ندی نه بوو. دهرهتا وی یا چؤنا بهر ب باژیری ژئ پیخه مهت خواندنی نه بوو. مامۆستایی وی کو خه لکی نه دهنی بوو، ئه ق تشتته دزانی. ژ بو مالباتا مام زهکی پیشنیارهکا بقی رهنگی کرپو: «ئه ز دزانم دهرهتین وه یین ئابوری ری نادهن هوین سماییلی بنیرنه خواندنی. لی سماییل خورتهکی ژیره، ئه ز دخوازم هه می بهرپرسیاریا وی هه لگره سه رملی خوه و سماییلی بنیرمه خاندنگه ها ناڤه ندی»

مالباتا مام زهکی، ب ریزداری ئه ق پیشنیاره رهد کربوو. هه که مام زهکی چوبا باژیری، دبیت زارۆکین مسلمانا سفکاتی ل وی کریان و دلئ وی شکاندبان. لهورا ژبو خواندنی نه هه نارتنه باژیری. مالباتا مام زهکی ژئ وهکی مالباتین دی گهلهک هه ژار و بی داها تی بوون. ب چاندنا چه ند بهؤست زهقی و ب خودانکرنا چه ند بز ن و په زان، هه ول ددان دهبارا ژینا خوه بکه ن. مام زهکی د ناڤ مالباتی و گوندیان دا بیو سیمبولا ره وشت و هشمهندی و خوه په ژرینی. وی ژئ هه ز دکر بهردهوامی بدهته خاندنگه هئ. زارۆکین ئیزدی یین کو خاندنگه ها سه رهتایی بدوماهی دئینان، گهلهک کیم که س دچوونه خاندنگه ها ناڤه ندی یا ل قوبینی.

ژ بو برایی من براهیم: «ل قوبینی هه قالیی ته هه نه، مرۆقین مه هه نه. من دگهل ئیک ژ وان بنیره، ئه ز دی چه خاندنگه هئ» لی برایی وی ئه ق تشتته قه بویل نه کربوو. وی ژئ گوتهبوو: «کهکی زهکی، ل گوندئ خوه بمینه، په زی بچه رینه» براهیم برایی مام زهکی:

خاندنگه ها سه رهتایی ل شاهسمی بوو، بهرئ دچوو وی دهرئ و دییلوما خوه ژئ ل وی گوندی وه رگرت بوو. ژ من پرسئ، تو ل قوبینی که سهکی ئیزدی ناس دکه ی؟ دخازت ل قوبینی خواندنا خوه بهردهوام بکته. لی من دیت تشتتی فه ر چه راندنا په زی یه و زهکی ژئ بقئ چه ندئ رازی بوو. مام زهکی پیداکری لسه ر نه کر و ل گوندی ما و شقانیا په زی کر. ل وان سالین کو مام زهکی خاندنگه ها سه رهتایی بدوماهی ئینای، کهکی وی ل باتمان په ترۆلی

کارهک دیت بوو. هندهک پارین وی هه بوون، ب قان پارا ب نیڤ بها ژ کوردهکی مسلمان، برهکا په زی کرپوو. لهورا ژبو خواندنی، مام زهکی نه هه ناردهبوو باژیری و که ریی په زی رادهستی مام زهکی کرپوو. مام زهکی، وی دهمی هیشتا ۱۱ سالی بوو، لی ب باشی چاقئ خوه ددا په زی. ژیر سیوانا وی که ریی په زی کو هه ر دچوو و دزا، رهوشا وان یا دهبارا خیزانی هندهکی باشتر دبوو. مام زهکی، ۷ سالان شقانی قی که ریی په زی کرپوو. ئیزدی گهلهک هه ژار بوون، سه ره پای کو دهولتهتی سه رانه ژئ و وان دستاندن لی چ خزمه تهک ژبو ئیزدیان نه دکر. ژ بهر ئیزدی بوونا خوه، وان نه دشیان بچه باژیران و بو خوه کار بکه ن و دهبارا ژینا خوه بکه ن. دهمی ژبو کار، ژ جه و وارین خوه دهردهقتن ژئ هه ر دهاتنه کیم کرن و سفکاتی ب وان دهاته کرن و ل وان ددان، هه تا کو هندهک جارا دهاتنه کوشتن. که سی ژئ چ لپیرسیین ل سه ر کوشتنا وان نه دکر. ئه و ژئ رۆژ برۆژی زیدهتر هه ژار و بی په نا دمان.

ل سال ۱۹۶۶، پیلهکا نوی یا کوچبه ریی دهست پی کر. ل ئه لمانیا ستاندنا کارکه ران دهست پی کرپوو. ترکیی دهرهگه یین خوه ژبو چؤنا بهر ب ئه لمانیا فه کر بوون. دهولتهتا ترک ژئ دخاست ئیزدی وهلاتی خوه بجه بهیلن، لهورا وان گهلئ ئیزدی بو قئ چه ندئ هان ددان. ژبو کو ئیزدی دهستا ژ جه و وارین خوه به ردهن، هه ر رهنگی دهرهفتهکی ژبو وان خوهش دکرن. ل باتمانی و بشه ریی کوچا بهر ب ئه وروپا، ب تایبته بهر ب ئه لمانیا دهست پی کرپوو.





احلاص محسين

از چي بيشم

ايرو ٨/٣ وکا هر سال اف بيف و هوزان و هلبهسته،
داخازا ما ايزديه نب تني کوهدانو جاف و دسته
افا بو ١١ سالا دايک و خوشکيت مه مان بر دسته،
هکا ام بيشن اف شيانا جما ١١ سالا ام تيدا ونداينا،
قيرينا دايکه کهايه عصمانه

از چي بيشم ژبو وانيت هاتينا سر ژيکرن
از چي بيشم ژبو وان کجيت دست زنجير کري
يا زاروکی لبر بيسيرا دايکه خودا بحجين اف جي دنيايا
خونا هر سالا وهايا

کوشتنا ميرا و کرتن و فروتنا کج و دايکه

ال سوکا بي بهايا از ج بيشم ژبو وان هستين ماينا لبر بارانا
يان ايت ماین لبر فرمانه اف جي بارکي کرانه هاوارا جي دردکي بي درمانه
دای فان بي وجدانا جب باب و برايت مه کرن فان بي وجدانا
نا دينا و نا ايمانه هيڤيا وان اش في ملتي تني نمانا
از جي بيشم، ژبو ميرخوازيت کرزرکا مال ويران سيبايا بي کفن هاتيا کور کرن
از جي بيشم، ناف کرزرکا خورا دجم و تيم جههکي مال ويرانا
جي دردکي بي درمانا قيرينا ما ناکهي نيف جفات و ديوانا
هرو ال في روشي برينا ما بي درمانه
هرو في روشي بيرينا مه بي درمانه

-كيف تقيّمون علاقة المريض بالطبيب في المنطقة؟ وما الذي ينتبهه أو لا ينتبه إليه المرضى خلال العلاج؟
العلاقة غالبًا طيبة لكن يغلب عليها الطابع العلاجي لا الوقائي، فمعظم المرضى يأتون بعد تفاقم المشكلة، ولا يولون اهتمامًا كبيرًا بالتعليمات الوقائية التي يُقدمها الطبيب.

-ما هي أبرز الصعوبات التي تواجهونها أثناء علاج الأسنان؟
نواجه صعوبات عدة، منها نقص بعض المواد الأساسية، ضعف تجهيز العيادات، بالإضافة إلى قلة الوعي مما يصعب من تقبل المريض لإجراءات العلاج الوقائي أو التجميلي.


-كيف تؤثر الظروف الاقتصادية في المنطقة على إمكانية الحصول على خدمات صحة الأسنان؟
الوضع الاقتصادي يؤثر بشدة، فالكثير من الأهالي يؤجلون العلاج بسبب التكاليف، مما يؤدي إلى تفاقم الحالات. العلاج الوقائي غير متاح بسهولة، وغالبًا ما يُفضل المرضى الحلول السريعة مثل الخلع حتى في أعمار صغيرة.

- ما هي أنشطة التوعية التي ترون أنها ضرورية للحفاظ على صحة الأسنان في سنكالك؟
نوصي بحملات توعوية في المدارس، الندوات المجتمعية، توزيع منشورات مبسطة، إضافة إلى إدماج التثقيف الصحي في البرامج الإعلامية والأنشطة المجتمعية.

- هل لديكم خطط أو مشاريع مستقبلية لتحسين صحة الأسنان في سنكالك؟
نسعى للتعاون مع منظمات صحية لتوفير عيادات متنقلة، وزيادة عدد الكوادر الطبية، بالإضافة إلى إطلاق برامج توعوية مستدامة موجهة لجميع الفئات العمرية.

- وأخيرًا، ما هي الرسالة الأهم التي تودون توجيهها لأهالي سنكالك بخصوص صحة الأسنان؟
نقول لأهالي سنكالك: الوقاية دائمًا أفضل من العلاج. العناية اليومية البسيطة بالأسنان تُجنبكم الكثير من الألم والتكاليف لاحقًا. ابدأوا بتعليم أطفالكم، وراجعوا طبيب الأسنان بانتظام، فصحة الفم جزء أساسي من صحة الجسم كله.

”لعلاقة غالبًا طيبة لكن يغلب عليها الطابع العلاجي لا الوقائي، فمعظم المرضى يأتون بعد تفاقم المشكلة، ولا يولون اهتمامًا كبيرًا بالتعليمات الوقائية التي يُقدمها الطبيب.“



مقابلة دكتور حسن حبابي

معلومات عن صحة الأسنان

-كيف تقيّمون الوضع العام لصحة الأسنان في سنكالك؟
الوضع العام لصحة الأسنان في سنكالك لا يزال دون المستوى المطلوب، نتيجة لعوامل متعددة مثل قلة الوعي الصحي، العادات الغذائية غير الصحية، وضعف البنية التحتية الصحية في المنطقة، خصوصًا ما يتعلق بالكوادر المتخصصة وعيادات الأسنان المجهزة.

-ما هي أهم النقاط التي يجب على الناس في سنكالك الانتباه لها للحفاظ على صحة الأسنان؟
أهم النقاط هي: تنظيف الأسنان مرتين يوميًا، تقليل استهلاك السكريات والمشروبات الغازية، والمشروبات الكحولية بشكل خاص. مراجعة طبيب الأسنان دوريًا، والتثقيف حول أهمية العناية بالفم خصوصًا للأطفال.

-هل تسوس الأسنان، أمراض اللثة أو فقدان الأسنان أكثر انتشارًا في فئة عمرية معينة؟
التسوس شائع جدًا بين الأطفال والمراهقين، بينما أمراض اللثة وفقدان الأسنان أكثر شيوعًا بين كبار السن، خصوصًا بسبب غياب المتابعة الوقائية في المراحل المبكرة.

-هل يوجد لدى الأطفال في سنكالك وعي كافٍ ومتابعة جيدة لصحة الأسنان؟
للأسف، الوعي لا يزال ضعيفًا بين الأطفال، ويرجع ذلك لغياب التوعية في المدارس وضعف دور الأسرة في تعليم العادات الصحية منذ الصغر.

- ما هي الأخطاء الشائعة في العناية اليومية بالأسنان برأيكم؟
أبرز الأخطاء تشمل: إهمال تنظيف الأسنان، استخدام الفرشاة بطريقة خاطئة، تجاهل مراجعة طبيب الأسنان إلا عند وجود ألم، والإفراط في تناول السكريات والمشروبات الحمضية دون عناية لاحقة. ٤- ما أكثر

-هل تسوس الأسنان، أمراض اللثة أو فقدان الأسنان أكثر انتشارًا في فئة عمرية معينة؟
التسوس شائع جدًا بين الأطفال والمراهقين، بينما أمراض اللثة وفقدان الأسنان أكثر شيوعًا بين كبار السن، خصوصًا بسبب غياب المتابعة الوقائية في المراحل المبكرة.

-ما هي أهم النقاط التي يجب على الناس في سنكالك الانتباه لها للحفاظ على صحة الأسنان؟
أهم النقاط هي: تنظيف الأسنان مرتين يوميًا، تقليل استهلاك السكريات والمشروبات الغازية، والمشروبات الكحولية بشكل خاص. مراجعة طبيب الأسنان دوريًا، والتثقيف حول أهمية العناية بالفم خصوصًا للأطفال.

-هل يوجد لدى الأطفال في سنكالك وعي كافٍ ومتابعة جيدة لصحة الأسنان؟
للأسف، الوعي لا يزال ضعيفًا بين الأطفال، ويرجع ذلك لغياب التوعية في المدارس وضعف دور الأسرة في تعليم العادات الصحية منذ الصغر.

- ما هي الأخطاء الشائعة في العناية اليومية بالأسنان برأيكم؟
أبرز الأخطاء تشمل: إهمال تنظيف الأسنان، استخدام الفرشاة بطريقة خاطئة، تجاهل مراجعة طبيب الأسنان إلا عند وجود ألم، والإفراط في تناول السكريات والمشروبات الحمضية دون عناية لاحقة. ٤- ما أكثر



بقلم / شرقان مندلي

جينوسايد الايزيدية، السلطات العراقية بين المواقف الناعسة والضماير النائمة!

الايزيدية

الايزيدية هي أحد المكونات العريقة التي سكنت في ميزوبوتاميا (وادي الرافدين) تاريخياً منذ آلاف السنين، يتميز المجتمع الايزيدي بحبه للسلام والتعايش وتمسكه بقيمه وموروثه الذي تمسك به عبر التاريخ، وهذا ما أدى الى تعرضه للإبادة الثلاثية والسبعين في زمن العثمانيين، وكذلك الإبادة الجماعية الأعنف التي تعرض لها في آب/ ٢٠١٤ على يد داعش. يتمركز تواجد الايزيديين في العراق بشكل رئيسي في قضاء شنغال (سنجار) ومنطقة شيخان ودهوك، إضافة لتواجدهم في مناطق أخرى من الشرق الأوسط كسوريا وتركيا.

الجينوسايد والابادة الجماعية

شن تنظيم داعش هجوماً وحشياً على شنغال (سنجار) في أغسطس ٢٠١٤ في ظل انسحاب مفاجرٍ لپيشمرکه الحزب الديمقراطي الكردستاني الذي كان يسيطر على المنطقة، أسفر ذلك عن قتل وخطف واستعباد واغتصاب آلاف الايزيديين بمن فيهم من رجال ونساء وأطفال وشيوخ، إضافة لبيع البنات والنساء كسبايا ونقل بعضهن الى خارج العراق

واجبارهن على الزواج القسري وتغيير دينهم، والكثير من الناجين والناجيات يعانون صدمات نفسية وجسدية عميقة. هناك حاجة ماسة للدعم النفسي والاجتماعي لإعادة تأهيلهم ومساعدتهم على الاندماج في المجتمع. كما أن آلاف الايزيديين ما زالوا في عداد المفقودين، مما يترك عائلاتهم في حالة من الألم والترقب. وقام داعش بإعدام الرجال والفتيان والنساء المسنات، سواء ممن رفضوا التحول إلى الإسلام أو حتى بعض من وافقوا مكرهين.

